

ARMANC
Xwedî : Yekîtiya
Karkerên
Demokrat
ên Kurdistan
*
Ji mehê carekê
dertê
Hejmar : 64
Îlon 1986
Buha : 10 Skr.
3,5 DM

Armanac

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALÎZM

ARMANC
Monthly Kurdish
magazine

Issue by
The Democratic
Union of
Kurdish Workers
Nr. : 64
September 1986
Price : 10 Skr.
3,5 DM

Adress : YKDK, Nordenflychtvagen 20, 112 51 Stockholm, Tel: 08/52 87 56 Adresa têkilî û naman : P.O. BOX 240 12 750 24 Uppsala/SWEDEN Postgiro: 50 37 99 - 9/ ISSN 0348-7185

* Ordiya Tirk, bi fantomên Amerîka li Kurdistana Iraqê bombe barand.

* Mesela kuştina 12 leşkerên Tirk ne sedem lê hicet e ji bo êrîşê. Hê di 25'ê Tir-mehê de Tirkan biryar girtibûn ku êrîşê Kurdistana Iraqê bikin.

* Pêşmergeên Kurdistanê di alarmê de ne û xwe hazirkirine ji bo êrîşa Tirkan.

XWÎNXWARIYA ORDIYA TIRK

Tirsa Dilê Tirka û Wezîfên Kurda

Piştî êrîşa ser Kurdistana Iraqê, her çiqas Serokwezîrê hukumeta faşîst a Tirk îddîa kir ku mesela kuştina 12 leşkerên Tirk wan mecbûrî êrîşek wiha kiriye, bi eşkerbûna biryara hukumetê ya êrîşê ku 17-18 roj berî kuştina leşkerên Tirk bi dizî hatibû girtin, xuya bû ku ev ne sedem, lê bahane ye ji bo vê xwînrejîya han.

Di mesela şoreşa Kurdistana Iraqê de, niyet û karên rejîma dîktatoriya Tirk, ne meçûlê kesî ye, hê ji mîj ve tê zanîn. Dewleta Tirk, çawa pêşveçûna tevgera rizgarîxwaziya Kurd li Kurdistana Tirkiyê xeteriyek mezin ji bo xwe dibîne, ya Kurdistana Iraqê jî her wisa dibîne. Piştî şerê navbera Îran û Iraqê ketiye qonaxek wilo ku mêzîn li dijî Iraqê meyl buye û pêre jî şoreşa Kurdistana Iraqê gavên berpêş davê, ev xeterî ji bo Tirkan zêdetir buye.

Loma jî bi taybetî van sê-çar salên dawî hukumeta Tirk rîya Bexda û Tehranê kîiye wek rîya kaniyê, her roj serî li hukumetên wan paytexta dixîne û dixwaze mewqîfêkî mişterek li hember tevgera Kurdî bê sitendin. Hukumeta Saddam tifaqdariya Tirkan qebûl kiriye, pê re ketiye nav planên mişterek. Di encama vê tifaqdariyê de, di nav sê salên dawî de bû cara sisêyan ku Ordiya Tirk bi firehî êrîş dibe ser Kurdistana Iraqê.

Tirk jî dibînin ku vê sala em tê de ne, hin pêşveçûnên nuh bi xwe re aniye. Jialîkî de hêzên pêşmerge di şerê çekdarî de, bere bere zora dijmin dibin, herêmên nuh ji bin nîrê dijmin rizgar dikin. Ji aliyê din de jî mesela şerê birakujîyê ya navbera Kurda ber bi hebûnê ve diçe, guftûgo di navbera hêzên siyasîyên Kurd de çêdibin û ev hêz dixwazin, problemên xwe di rîya aşîtiyê re çareser bikin. Heta Tirk dibînin ku ihtîmala hevkarî û yekîtiya hêzên Kurdistanê jî ne dûr e. Û a girîngtir, li ber çavên wan e ku vê rawşa han tevgera rizgarîxwaziya Kurd li hember dijmin xurttir û roja serfiraziyê nêzîktir dike.

Pêşveçûna şerê rizgarîxwazî û qelsbûna rejîma dîktatoriya Bexda li hember vî şerî û şerê navbera Îran û Iraqê, eşkere dike ku rojên Saddam jîmartî ne. Bi serketina tevgera Kurd û têkçûna Iraqê li hember Îranê dikare mîzana xerîta Rojhilata Navîn bi carekê de biguhere. Petrola Mûsil û Kerkûkê û xeta petrolê kare têkeve bin destê Kurdan. Vê yêka han tirsêk mezin di dilê Tirkan de difirîne, xewa şevan li wan diherimîne. A sedemê esasî yê êrîşa Tirkan ev e. Ew dixwazin ji niha ve firsenda pûçkirina tevgera Kurdî têxin destê xwe.

Helbet ev yek, li hesabê emperyalîzma Amerîka û NATO'yê jî tê. Hêzên emperyalîst jî dibînin ku di şerê herdu dewletan de û biserketina tevgera rizgarîxwaziya Kurdî re ewê gelek ji berjewendiyên xwe yê herêmê winda bikin û statuya herêmê serûbinî hev bibe. Ew bi vê yekê qaîl nabil nabin û niyeta xwe eşkere dikin ku wê nehêlin guhertinên wiha di herêmê de çêbibin.

Dûmahîk r.6



Teyarek Tirk di êrîşê de

Mesûd BARZANÎ: "Ger Tirkiye êrîşên xwe ranewestîne, em diyar dikin ku emê bersîva wan, li gor wext û mekanê ku em tesbît bikin, li wan bi şûnde vegeînin".

Ordiya Tirk roja 15'ê Tebaxê, bi ber destê sibê re, bi fantomên Amerîkî bombe barand ser erdên Kurdistana Iraqê. Gund û mezerên Kurden béguneh, di bin êrîşa hov

û har a Ordiya Tirk de hatin hilweşandin. Bi dehan mezin, zarok, mîr û jin hatin kuştin û birindarkirin.

Piştî êrîşê serokwezîrê hukume-

ta Tirîk a faşîst derket ber rojname û kamarên televizyonê bi barbarîya xwe ya bav û kala da îlan-kirin ku teyarek şer êrîş birine ser goya meqerên ku hêzên pêşmer-

gên Kurdistanê û di nabêna 160-200 kes hatine kuştin: Turgut Ozal bi durûtî sedemê vê êrîşa hov û xwînrejî, kuştina 12 leşkerên

Dûmahîk r.7

Hêzên Kurd Li Dijî Êrîşê

PPKK : "Êrîşa Ordiya Tirk a dawî carek din nîşan da ku têkoşîna li her perçekî Kurdistanê, bi xurtî bi têkoşîna perçên din ve girêdayî ye. Rojekê zûtir divê em wacibên vê yekê bi cîh bînin û hêzên xwe bikin yek, bi piştgirî û hevkarîyek di bin sîdariya otorîtek netewî de em werin ba hev".

Êrîşa Ordiya Tirk a ser Kurdistana Iraqê, ser pêşmerge û gundiyan béguneh ên Kurdistanê, kîn û nefreta milletê Kurd kişand ser xwe, partî û rêxistinên siyasî yê hemû perçên Kurdistanê, çi yeko



Meşa Stockholmê

yeko, çi jî bi hev re, li dijî vê êrîşê dengê xwe, bilind-kirin û rûreşîya dijmin xistin meydanê.

Dûmahîk r.7

Li Tirkiyê hilbijartin

Li Tirkiyê, li 10 bajaran hilbijartin çêdibin. YEKÎTIYA ÇEP: Dengên xwe nedin partiya Ozal.

Dûmahîk r.7

Lîbya û Îranê êrîş rûreşkîrin

* KADDAFÎ: Êrîş wek ya Siyonîstan û ya rejîma nijadperesta Afrîka Başûr e.

Dûmahîk r.6

Li Ser Edebiyata Zarokan

Pir-hindik carnan ez ji li gor xwe tevî munaqêşên li ser edebiyata zarokan bûm. Lê çarçewa munaqêşên me û asoyên dîtina me bi wan zanyarî û fêkiyên kitêbê Tirk hatibûn hidutkirin ku li welatekî weka Tirkiyê, ji azadiya çape-menî û weşanan a fireh bêpar, derdiketin. Buyerên edebiyatê ên li dinê, her tim, bi kêmasî me çarîk sedsal ji dawiyê taqîb dikir, bi tu awayî me rê nedidit ku em tekevin nav buyer û munaqêşên aktuel. Li Tirkiyê, ev yek hê jî wiha ye, heta ew kesên ku hêviyan ji paşdemayina kulturî ya gel dikin, li ser hukum bin jî wê her wiha dom bike.

Di warê edebiyata zarokan de niqta merkeziya munaqêşeyên pêşin, pirsar "Gelo edebiyatek bi navê edebiyata zarokan heye, yan na?" bû. Dem hat, ev yek derbas bû. Mijar (mewzû) her ku çû bi alî zelaliyê de pêşveçûnek girt ber xwe. Êdî ji devla hebûn û tunebûna edebiyata zarokan, pirsar "edebiyata zarokan çiyê?" bû niqta merkeziya munaqêşê... Edebiyata zarokan çiyê, çî nîne? Êdî pirsar bingehin ev bû di warê edebiyata zarokan de. Ev pirsar jî her ku çû hat şirovekirin, xusûsiyetên edebiyata zarokan ên taybetî (xas) û xusûsiyetên şekî hatin rojevê, hinkî din jî çû em ketin nav teferrûatan (tefsîlat) û bi vî hawî em

hatin van rojan. Ew pirsar berê, a "edebiyata zarokan çiyê, çî nîne" îro jî aktualîta xwe diparêze, lêbelê bersîva pirsê hîn bêtir zelaltir dibe.

Li aliyê din mesela sînora edebiyata zarokan heye ku, ev, mîna do, îro jî hîn wek gelşekê disekine. Gava meriv bigre ber çav ku di jiyana însan de, rojên zarotiyê bi buyerên gelek lezbuhêr tije ne. Xuya ye ku sînore edebiyata zarokan wê sibê jî ji bo nivîskarên xusûsiyeta xwe ya gelşitiyê biparêze. Lêbelê ji bona ku em sînoren nivîsê li gor îmkanan teng bigrin emê di vî nivîsê de nekevin vî mewzuyê.

Ji encama tebiî ya dan û stendinên me (a rasttir stendinên me) yê kulturî bi dinya sermiyardarî reya ku ji berê de em pêre di tîkiliyan de ne, berî her tiştî nasîna me bi mînakên edebiyata zarokan ên rojava re çêbûn.

Piraniya me, di riya pirtûkên Polyanna, Robenson Crouze, Macerayên Guliver re ketin dinya pirtûkên zarokan. Lê gava piştî salên 1970'î em rastî pirtûkên zarokan yê bi dîtinek nuh, pêşverû û bi naverokên civakî nivîsandî hatin me bi hawakî ecebmayî got: "Ha!.. Nexwe wisa jî tê nivîsandin ha!.."

Ez van jî bo vî yekê dibêjim: Dema em radibin, rûdinên dema em dinivîsin û diaxifin, eger ku her

tim navê pirtûkên ji dinya rojava (kapitalist) tî ser zimanê me, ev ne jî ber heyraniya me ya ji rojava re ye, gelek berî ku em dîtînen sosyalîst nasbikin azadiya me bes xwendina eserên ji dinya rojava bû. Û hetta ji azadiyê jî wêdetir, teşvîkbûyîna me ya ji bo xwendîna wan e. Ji ber vî yekê jî ez dikarim bêjim, wek navê pirtûkên zarokan yê qirnê me, bêtirin di hiş de ev nav hene.

Di esas de him li welatên kapitalist yê pêşketî û him jî li civakên sosyalîst ehemiyetek gelek mezin ji edebiyata zarokan re tê dayîn. Lêbelê dîtina her du civatan ya zarokan, hêviyên wan ji zarokan cihê cihê ne û ji ber vî yekê jî tefsîra wan ya edebiyata zarokan jî gelek cuda ye. Lêbelê ev heye ku, pedagojî (ew kesên ku li karê fêrkirine mijûl dibin) her du civatan yê ku serê wan dixebite, zanayên wan, psikolojîkên wan, nivîskarên wan zarokan baş nasdikin, ehemiyetek mezin didin zarokan, bi çavekî îstîqbal li wan mêze dikin.

Belê, bi rastî ma zarok çiyê? Hinek dibêjin "wê qîza min mezin bibe û bibe dê". Hinek "bira lawê min mezin bibe, bixwîne, bibe meriv" dibêjin. Hinek jî dibêjin "bira qîza min mezin bibe, bibe bijîşk (doktor)". Van daxwazan, xwenda yan jî nexwen-

Ebubekir PAMUKÇU

da, yekî ji Kurdistanê yan jî Tirkiyê yan jî yekî kijan welatî dibe bila bibe, yanî daxwaza her dê û bavî ye ku her dem dikare bixwaze.

Dema vana dibêjin, meriv nikare bibêje ku qet yek jî li gor normên (pîvanên) ilmî dipeyivin. Lê bi rastî ev gotin rastiyeke îfade dikin: Zarok îstîqbal e...

Her dema ku dibêjim "zarok îstîqbal e" vî gotina helbestvanekî Îngilîz di bîr tînim: "Zarok bavê însan e", ev gotinek çiqas xweş e. Rastiya ilmî ya di derheqê zarokan de çiqas jî xweş îfade dike. Zarok bavê însan e.

Ji xwe loma ehemiyetek mezin ji zarokan re û ji edebiyata zarokan re tê dayîn.

Piştî ku rastî ev e, nexwe em ji alî naverokê ve edebiyata zarokan digirin dest xwe, bixwaze nexwaze tîkiliya edebiyat û civatê derdikeve hember me. Lêbelê beî ku li ser vî mewzuyê dîr û dirêj bisekinim bi kurtayî ezê viya bibêjim: **Armanca edebiyata zarokan, "wek bavê însan" li gor hêviya ku ji zarokan tê payîn, tê guhertin.** Ji ber vî yekê jî nêrîna ronakbîrêkî burjuwa li ser mew-

Dûmahik r. 7

Stiriyên me

Bavê Nazê

SAL BI SAL XWEZÎ BI PAR !

Di dema gurbûna raperîna Kurdan a salên 1961-1975'a de, heger riya meriv bi mala hevalekî biketa, pêre-pêre zarokên wî xwe davêtin hebêza meriv û digotin:

-Apo em jî heval in.
Çi bêjeyên şêrin, xweş û bi mebestek kûr û dîr bûn!
Lê îro li Ewropa zarokên me jî, mîna me çavên xwe li heval û hogiran digerin. Ew jî wek me jî rewşa xwe ne razî ne. Carna jî li ser qerfên zarokên "yên jî me çêtir", (li welat, heyamê berê ev gotînen han li ser cinan digotin, niha li Ewropa ji kesên xwediyê cî re dibêjin) jî iyare xwe derdikevin. Ew jî wek me, ji porê xweyî reş aciz in û ne dîr e, ku xewna dibînin, ku porê wan kej û zer e û rengê dimê wan jî sor û sipî ye.

Bi kurtî hemû nexweşiyên civaka nuh zarok jî mîna me mezinan bi xwe re hiltînin. Ev nexweşî jî pir in wek lehiyê xurt û bi qawet in, hemû tiştî li ber xwe dibin. Helbet berî hemû tiştî zarokan li ber xwe dibin. Loma jî gava berî demekê zarokêkî jî yê hevalekî ev pirsên han jî min kirin, ez behetî (ecêbmayî) nemam:

-Apo, tirimbêla te heye?
-Na. -Min wiha bersîva xwe da û ji we venaşêrim bi vî tunebûnê ez li ber xwe ketim. Helbet kurik ev tişt di rûyê min de nexwend, loma pirsên ku di dilê wî de bûn da pê wan:
-Televîzyon û vîdyo li mala te hene?
Ji rûşîya min, ev tiştên han jî li cem min tunebûn. Ji ber wilo bi dengêkî melûlî min lê vegeand:
-Çavê apo televîzyon û vîdyo jî li mala min tune.
Kurik bi hawakî wilo li min nêrî, mîna kesê ku bêje "ma mal bê van tiştan dibe?" Piştî bédengiyê ne dirêj dîsa pirsî:
-Û piskilêt jî li cem te tune?
Dema min bi "na" bersîv da, bi awirên wilo li min nêrî, mîna ku bêje: "Ma tu ne zilamî?" Dûre piştî xwe da min û çû...

ji wan dibe memûrekî piçûk û yê din jî hin dek û dolaban digerin û dibe dewlemendekî mezin, xweyê milyaran û kargehan.

Demek dirêj bi ser dikeve, memûrê piçûk jî hevalê xweyê maldar re namekê dişîne:

"Ez vî namê jî bo ku tu jiyana me ya derbasbuyî, di bîra xwe bînî, dişînim. Hêviyek min jî te heye tu lawê min hilîni kargehek xwe".

Demek bi ser dikeve bersîva maldar te:

"Dema min dixwend zarokêkî mîna te, wek xewnên şeva tê bîra min. Tika kar jî min dikî, ji gava dostên me yê leşker dest danîn ser karîne û vir ve, min nivê karke-ran ji kar derxistin. Loma jî ezê lawê te nikaribim hilînim kar".

Memûrê piçûk nama diduya dişîne: "Min di nama xwe ya pêşin de tiştêk jî bîra kiribû, ji lawê min re 500 milyon ji piyangoyê derketibû, lawê min dixwaze bi vî pereyî bi tera şirkatiyekê bike".

Maldar namê digre nagre, di cî de persîva wî dide: "Hevalê delal û şîrin wan rojên me yê derbas-buyî çiqas xweş bûn! Tu lawê xwe bişîne cem min, min çawa te himbêzîkir, ez bi wî awayî li hêviya lawê te me û ji himbêzîkirina wî re jî hazirim".

Memûrê piçûk cara paşî dinivîsîne û dibêje: "Xwînxwarê heram! Lawê min jî tune û 500 milyon wî jî tune. Min xwest ez te biceribînim. Hat zanî ku dîsa ew xwînxwarê kevin i".

Ji maldara re pêşkêşî dikim. Hikmet Hannover-Almanya

JINÊN KURD

Di newala êş û derdan a Kurdistanê de, ên pirtirîn bindest in û keda wan tê xwarin jin in. Ew him di bin darê zorê de ne, rûme-

Rahîme Almanya Rojava



WE PÎROZ DIKIM

Rojaname ya we, piştî demek dirêj seranser bi Kurdî derket û bi rastî bû hêviyek ji bo xwendekarên Kurd.

Îro li cihanê jî xeynî me tu gel, millet tune ku bi zimanê xwe napeyive û nanivîse. Milletê Kurd bi sedsalan, di bin nîrê mêtîngêhkarên de hatiye xwunavtin (asîmle kirin) û hemû mafên wî ji destên wî hatiye stendin, ji hemû tiştan hatiye mehrûm kirin. Bi her awayî xwestine milletê Kurd ji holê wenda bikin.

Lê milletê Kurd heta îro hebûna xwe parastîye û bi her awayî tîkoşîna xwe daye, ji bona vî jiyane, tîkoşîna îro jî dom dike.

Hebûna milletan yek jî makzîmanê wan e lazîm e, bi her awayî zîmanê xwe biparêzin û pêşve bibin. Ji ber ku zîman jî bo hişyarkirina milletekî navgînek xwenaskirîne ye. Bi xêra zîmanê axaftîne ye ku îro hewqas nivîs, çîrok, helbest û hebûnên dîrokî hatine parastin û belavkirin.

Ji bo vî yekê, ez biryara we di cih de dibînim. Weku em hemû dizanin nûçeyên Kurdî bi zîmanê Kurdî pîr kêm derdiket û valatiyek mezin di warê nivîsandîne de hebû. Lê rojnama Armanç, ku ne bi temamî be jî, wê gelek kêmasîyan ji holê rabike û bi hindikayî wê hinek cihan tijî bike.

Ji bo xwendekarên Kurd wê bibe hêviya destpêkê. Bo belav kirina zîman û kulturê divê bi van navgînan bê parastin û pêşvebirin.

Di destpêka xebata we de serketînen herî bilind daxwaza min e. Bimînin di rojên xweşiyê da.

XWEDÎWAR BIYANÎ

- Bona welatê xwe
- Me her gav SILAV KIR JI MIRINÊ RA
- Em ku xwediyê wî warî
- Me tev nehişt bêxwedî
- Di hemû waran da, bi hemû awayî
- PARASTÎ YE WEKÎ KULÎLKËN SOSINAN
- Destên me dirêj in BAVO!..
- Hesreta dilê me, dest bi teqînê nekiriye
- Birûskên çavên me ji bo wan weşartî ne
- Di destpêka me da tîşfan e.
- XEZEBA reş û tarî
- bi ser xwe da nebarînin.....

Siyamed Paris

JI REDAKSIYONA ARMANÇ RE

Hevalên heja,
Di tîkoşîna rizgariya netewî û civakî cihêkî girîng e kovara ARMANÇ heye. Lê mixabin, ew demek dirêj ma rawestayî.

Hoyên ku bizava rizgarixwaza Kurdistanê û kovar û rojnameyên wê tê de ne, pir dijwar in. Lêbelê ew hoyên dijwar, çawa em jî tîkoşîna me ya giranbiha nedan rawestandin, divê em jî kovar û rojnamen xwe nedin rawestandin. Jiyandina kovar û rojnamen me li ser milên me ye. Wekî daxuyaniya Armançê ya ku dibin vî serrêzê de "bi hêviyek teze, bi destpêkek teze" ez jî bi hêviyek teze dixwazim bi çend nûçeyên wargehê xwe piştgirî ji Armançê re bikim. Ez bawerim jî îro pêve ezê karibim ji her hejmarekê re hindek tiştan binivîsim.

Dîsa bi hêviya xurtkirina Armançê, serfirazî jî xebatkarên Armançê re dixwazim. Piştigiriya Armançê barê ser milê me be.

Bi silavên şoreşgerî.
B.Zerdeşt
Kopenhag-Danîmarka

Jİ ARMANÇ RE

Hevalên heja,
Di hejmarê 63'an, di rûpelê diduya, di qismê "DI DÎROKÊ DE EV MEH" de, wiha

hatiye nivîsandin: "9-12 Tebax 1925: Serihildana Reşkotan û Reman tîk çû". Li gorî kesên ku bixwe ketibûn wê serihildanê ev dîtina "Serihildana Reman" ne rast e. Ên ku serihildabûn pêşî Sînikî, Reşkotî û Bekirî bûn. Tu roleka Reman bi awakî qenc di vî serihildanê de çê nebûye. A rastî, tersê nivîsara we ye, Remiya di vî serihildanê de, ji leşkerên Tirk re rêberî kirine, gundên Sînikî, Reşkotîya şewitandine. Di vî serihildanê de, bi seroktiya Emîne Ehmed, Rema bi leşkerên Tirk re zar-zêçê Kurdan qetîl kirine. Lê li gor nivîsara we, Remî jî, wek eşîreke ku "serihildaye" tê nîşandan!

Ez bawerim, ku hûn careke din wê buyera dîrokî di ber çav de derbas bikin, wê çaxê her eşîr dê cihê xweyî esasî bête rûniştandin.

Bi silavên şoreşgerî.
Hamît Swêd

Jİ ARMANÇ RE

Divê di serî de bibêjim ku ev cara pêşîne ku ez ji kovarek Kurdî re dinivîsînim. Ez hêvî dikim ku hûnê kêmasiyên min mazûr bivînin. Ger hun vî nivîsa min biweşînin ezê kêfxweş bim. Û ez, weşandina Armançê bi Kurdî, pîroz dikim.

MALDAR Û MEMÛR

Du kesên zaroktiya wan bi hev re derbasbuyî di zanîngêhê de bi hev re dixwînin û diqedînin. Yek

Pêşniyarên Nû Ji Yekîtiya Sovyet

*** M. Gorbaçov: "Em marotoryuma li ser tecruba çekên nukleerî heta serê sala 1987'a berdewam dikin".**

*** S. Achromejev: "Li ser qedexekirina tecrûbekirina çekên nukleerî, welatên Warşova amade ne, ne tenê ji bona kontrola berrî, her wiha hewayî jî".**

Di meha Tebaxê de li ser aştîyê çend pêşniyar û biryarên nû ji Yekîtiya Sovyet hatin:

Yekîtiya Sovyet wekî tê zanin li ser qedexekirina tecrûba çekên nukleerî ji serê 1986'a ve ye marotoryum îlan kiriye. Ev pêşniyar çend caran ji DAY (Dewletên Amerika Yekbûyî) re çû, lê ji aliyê wê de nehat qebûl kirin. Marotoryum heta heyva Tebaxê hatibû îlan kirin. Di nivê hevyê de M.Gorbaçov beyanek da. Di vê beyana xwe de, da îlan kirin ku marotoryum heta dawîya sala 1986 wê hê baje. Pêşniyar carek din ji



DAY re çû. Lê DAY vê pêşniyarê carek din redkir.

Reagan sedemê neqebûlkirinê, wiha da nîşandan, "em li dijî qedexekirina tecrûba çekên nukleerî ne, lê em li dijî qedexekirinek bê kontrol in. Em dixwazin ku di peymanek wiha de kontrol jî hebe".

Berê jî Yekîtiya Sovyet pêrgiyî van heceten DAY bûbû. Yekîtiya Sovyet ji bo kontrola qedexekirina tecrûba çekên nukleerî, kontrola berrî qebûl kiribû. Lê evyek jî ji bal DAY ve "kêm" hatibû dîtin.

Piştî vê beyana Reagan, di roja 29'ê Tebaxê de alîkarê Wezîrê Parastinê Maraşal Sergej Achromejev di Konferansa Stockholmê de beyan kir ku, ew ne li dijî kontrolê ne, him berrî û him jî hewayî bila bê kontrol kirin.

Lê ji bona DAY ditina hin heceten din wê ne pirr dijwar be! Çunkî Reagan, ne terefdarê qedexekirina tecrûba çekên nukleerî e, lê ji bo ku li ber raya giştî yê cihanê cih lê teng buye, her carê hecetekê jî xwe re sazdikeye.



Pinochet îcar ji mirinê filitî

Roja 8' Îlonê, suikastek li dijî diktatorê faşist ê Şilî Pinochet çebû. Di suikastê de pênc mihafizên Pinochet hatin kuştin, lê ew bi xwebirindar xelasbû.

Cepha Niştimanî ya Manuel Rodrîguez îlan kir ku êrîşa ji bo kuştina Pinochet ji bal wan ve hatiye kirin. Pinochet piştî êrîşê li temamê welat îdara urfî îlan kir û dest bi girtina mixalîfên xwe yê siyasî kir.



"Rambo"yî Qerekerêk Civaka Amerîka Yekbûyî ye

M. Bextiyar

Di 14'yê meha buhurî de li Amerîka Yekbûyî, li bajarê Edmondê yekî, postexana ku ew lê dixebitî, da bergulan. Piştî 14 kes kuşt û 4 kes birindar kir, gula dawî jî berra xwe da û xwe jî kuşt. Vî kesî di wextê eskeriya xwe de li dijî gelê Vîetnam şerkiribû.

Buyerên weha li Amerîka Yekbûyî pirr caran dibin. Di sala 1984'an de li bajarê Los Angelesê mirovek ket aşxanekê, kesên rûniştî gulebaran kir. Li dora 20 kesan hatin kuştin. Çendekî berî vê buyerê, yekî din jî ereba xwe li rêwiya qeliband, bi dehan kes kuşt. Buyerên weha li Amerîka Yekbûyî nayên jimartin. Wek wê bê bîra xwendevanan jî, li gor beyanên resmî yekî xwestibû bi qetla Serokê Dewleta Amerîka Yekbûyî Ronald Reagan, bide nîşandan ku çiqas ji keçekê hezdike.

Ev buyerên han çi nîşanî me didin? Civatek wek Amerîka Yekbûyî ku ewqas "pêşketî" û "azad" e çawa rê dide buyerên weha?

Belê rast e. Civata Amerîka Yekbûyî ji hêla teknîk, endustrî gelek pêşda çûye. Roja îro, ji alî zengînbûyuna aborî tu dewlet nagêhîjê. Rehên Amerîka Yekbûyî dighîje hemû axên(erdên) welatên kapîtalîst û paşdemayî. Ji alî komunikasyon, sektora banqa, şîrketên malî, çandinî, petrolê û h.w.d. de jî Amerîka Yekbûyî yekemîn e.

Lê ev hebûnên han di destên ji sedî 1'ê civatê de ne. Ev ji sedî 1'ê civatê ne tenê zengîne Amerîka Yekbûyî, her wisa zengîntirînê cihanê ne jî. Zêdetirî nivê zengîntirîn 500 şîrketên cihanê di dest vî ji sedî 1'ê civata Amerîka Yekbûyî de ye. Li alî din jî bi milyonan insan li Amerîka Yekbûyî birçî ne. Herê rojname, ajans bahs nakin (lewra ew jî di destê zengîne welat da ne), lê îro çi bêje -ne di merteba wan de be jî- qandî birçiyên Afrîka, birçî li Amerîka hene. Îro bi şiklekî resmî 46 milyon mirov birçî ne. Ji van bes 21 milyon ji dewletê alîkarî distînin. Ji sedî 15 jî civata Amerîka Yekbûyî bê kar in. Bi milyonan insan starek tune ku lê cîwar bin.

Zengîntirînê cihanê Amerîka Yekbûyî wekî civat, di hêla perwerdebûn, kultur û xwegihîştandinê de di sefaletek mezin da ye. Di nav dewletên kapîtalîst yê pêşdeçûyî de ji alî xwendin-nivîsandinê Amerîka Yekbûyî dawîya giştî tê. Îro ne tenê li Amerîka Yekbûyî, her wisa li hemû cihanê jî sedî 70'yî film û weşanên şidet, seks û maceraperestî li Amerîka Yekbûyî îmal dibin. Karbidestên dewletê jî vêya ne aciz in, jê fêdê dibînin.

Ev yek di dema Reagan de hîn pêşde çûye. Bi kurtayî Rambo'yî qerekerê Amerîka Yekbûyî ya dema Reagan e.

Di welatekî de kûratiya ferqa çîn û tebeqên civakî hewqas pêşde çûbe, li gor vê hîndekarî, kultur paşde mabe û insanên wê civatê dewlemendiyê li pêş çavê xwe bivînin û destê wan negihîjê û ji bo destgihîştinê jî rê, wek filmên kovboyî an Rambo'yî bi şidetêk ferdî be, di ser de jî ev bi qehremanî bê binavkirin, wê demê mirov di wî "welatê azad" de, wê bi azadî xelkê jî û xwe jî bikujin.

Sosyalîzma Real

MOXOLÎSTAN:

Zanyarî jibo hemûyan

Di plana 5 salan a dawiyê de, li Moxolîstanê, di ser 40 hezaran re kes jî zanîngê û dibistanên navîn û bi hezaran karker bûn pispor (sipsiyalîst). Hejmara xwendevanên dibistanên navîn di nav 5 salan de 50 hezar zêdebûn.

Moxolîstan, ji bo kadroyên sipsiyalîst ên netewayî û pêşketina zanyarî û kultura gelê xwe politîkek Marksîst-Lenînîst didomîne. Sala 1921'ê li Moxolîstanê jî bo hîndekariyê sistemê tenê hebû. Sala 1922'a di vî welatî de yê ku zanîngê (unîversîtê) xelas kiribûn 20 kes bûn û 500 kes jî bi dîploma dibistana navîn hebûn. Îro di zanîngê teknîk û teknîka pişê de di ser 60 hezaran keç û xort perwerde dibin.


Di 10 salên dawiyê de 130 dibistan û 330 pansiyonên (dibistanên şevîn) nuh deriyê xwe ji xwendevana re vekirin.

Civîna Dewletên Bêblok

Robert Mugabe di vê dewrê de wê serokatiya tevgerê bike.

Civîna Dewletên Bêblok a ku Harare paytexta Zîmbabwe çebû, xelas bû. Civînê di beyana xwe ya xelasîyê de, rejîma nijadperest a Afrîka Başûr rûreşkir, alîkarî û hevkarîya xwe bi gelê Afrîka Başûr û ANC re da nîşandan. Civînê herweha êrîş û provakasyonên Reagan û Amerîka yê di dijî Lîbya jî protesto kir û bala cihanê kişand ser van provakasyonan.

Li Pakîstanê Xelk Daketin Meydana



*** Dîktatoriya Ziya-Ul Hak a 9 salî, diheje. Her roj meş û tevgerên protestoyê li Pakîstanê çêdibin. Gel jî bo hilweşandina rejimê diherike kolanan.**

*** Dîktatoriya xwînrêj tevî Benazîr Butto bi dehan kes ji serokên muxalefetê girt. Di vê meha dawî de polis û leşker jî muxalefetê nêzî 50 kesan kuştin.**

Rejîma Ziya-Ul Hak di rojên tarî re derbasdibe. Bi sed hezaran xelk her roj ji bo protestokirina dîktatoriya xwînrêj dadikevin meydana. Di bin seroktiya Benazîr Butto de Partiya Gel a Pakîstanî serê muxalefeta dijî rejîma

kevneperest, dikîşîne.

Ev tevger, meş û protestoyên han bîn li dîktatoriya askerî diçîkîne. Di vê salê de dîktatorî, bi zora muxalefetê mecbûr ma, hin gavan ji pa re avêt: Urfî îdare rakir, fonksiyona mehkemên sivil

ji mehkemên eskerî zêdetir kir, bi qismî be jî hin taviza da partiyên muxalefetê jî bo bi resmî karibin karên xwe yê rêxistinî û kar û barên din bikin.

Lê muxalefet bi van heqa ne qayile, demokrasîyek berfireh, mafên mirovatî û hin daxwezên pêşketî dixwaze. Ji bo bi destxistina van armancan jî, gava pêşin, hîlbijartina giştî dixwazin. Nuha li Pakîstanê hedefa xelkê ku daketiye meydana, pêkanîna hîlbijartina giştî di demê nêzîk de ye.

Muxalefet serê çend hefta ne ji bo tevgerê gelek xurt, xwe ji roja "cejna serxwebûnê" re hazir dikir. Hêzên dîktatoriyê, ji bo rê li ber girtina vê yekê Benazîr Butto û bi dehan serokê muxalefetê "ji bo mehekê" girtin. Li ser vê, xelk êdî ji meydana dernayê. Her roj, her seet di tevgerên protestoyê de ye. Polis, leşker tim qeweta xwe serfdike, lê dîsa nikare ber lê bigre. Heta nuha hêzên hukumetê li dora 50 kesan kuştine.

Wisa xuya ye, dîktator Ziya-Ulhak gelek dijwar wê karibe vê hemla dawî ya xelkê bisekinîne.

Hîroşîma û Nagazakî Nîşana Hovîtiyê

41 sal berê di 6'ê Tebaxa 1945'an de li hîroşîma û di 9'ê Tebaxa 1945'an de jî li Nagazakî du bombeyên atomî hatin teqandin. Ji wan bomban yek, uranî û ya din jî bomba plutonîum bû. Serokê dewleta DAY, Truman emrê teqandina her du bomban dabû. Bi van bomban, herdu bajarên Japonyayê di demêkî pir kin de bû xwelidanka tîrêjên radyasyonê.

Li gor lêkolînekê ku ji alî alîmên Japonî hatiye, li Hîroşîmayê 140.000 insan dîci de an jî berî

dawîya 1945'an mirin. Ev reqem jî bo bajarê Nagazakî 70.000 e. Di sala 1950'î de hejmara kesên mirî li bajarê Hîroşîma 200.000 û li Nagazakî jî 140.000 bûn. Lêbelê hê jî mirov jî vê tofanê dimirin, seqet dibin yan jî bi nexweşînan bê derman dikevin.

Ma gelo teqandina van her du bombeyan pêwîst bû? Bersîva vê pirsê fizîkzan xwediyê nîşana Nobel a fizîkê P.M.S.Blackett, di kitêba xwe ya bi navê Şer an Aştî-

de weha dide, "bi rastî teqandina bombeyên atomî ne operasyona dawî ya leşkerî bû, lêbelê gavê pêşin ê mezin ê şerê sar li dij Yekîtiya Sovyetê bû, ku a nuha jî domdike."

Di sa derheq vê pirsê de, dirokzanên Amerîkî Gar Alperovits, di kitêba xwe ya bi navê Diplomasîya Atomî: Hîroşîma û Potsdam (1965) de weha dibêje, "êşkereye, ku Truman jî bo ku şîvek bi qewet bi dest xwe van bombeyan da teqandin, jî ber vê yekê

bû, ku Truman civîna Potsdamê ya 17'ê Tîrmeha sala 1945'an texir kir".

Belê ev bîr û baweriyên her du alîman rast in û em dikarin bi hêsanî rastîya wan bibînin. Wek tê zanin sistema sosyalîst û nemaze Yekîtiya Sovyet hê jî wê demê ve pêşniyara ji holê rakirina çekên atomî anî, lêbelê Amerîka Yekbûyî guh nedayê. Îro ne tenê Amerîka Yekbûyî û Yekîtiya Sovyet xwedî bombeyên atomî ne. Îngîlistan û Fransa jî bombeyên atomî çêki-

rîne. Îcar ku mirov wan her du bombên ku di sala 1945'an de hatin teqandin û yê iro bîne ber hev, yê iro sed car-hezar car jî yê 1945'an mestir û bi qewettir in. Ev tê manê ku dema iro şerokî weha destpêbike, wê tofanek herî xerabtir be.

Di 6'ê Tebaxê de dibe salek ku Yekîtiya Sovyet tecrûbekirina bombên atomî rawestandîye. Lêbelê Amerîka Yekbûyî di vî nabênê de 11 caran bombên atomî ceriband.



Hevkariya Civaka Ermeniya û Kurda

KARLANÊ ÇAÇANÎ

-3-

Nota Armançê: Di nivîsara Karlanê Çaçanî de, notên binî yên ku tê de derbasdibin, emê hemiya di dawiya nivîsarê de bi hev re çap bikin.

DI KIRÎN-FIROTINÊ DE DOSTANIYA ERMENÎYA Û KURDA

Dostaniya Ermeniya û Kurda, di nava kirin-firotinê de jî rind hatiye kîvşê û qalbûnê.

Kurda gelekî kêm bi miletên ditir re kirin-firota xwe dikirin, wan di giraniyê de bi Ermeniyên re dikirin. Di her qezakê de, her nahiyekê de, her gundekî de kirîvê wan î Ermenî hebûn. Wan, pez, rûn, penêr, hirî, çerm û hasilatên ditir, dibirin malên Ermeniya, li wir dihiştin, rojtira din difrotin wan; yan bi peretî yan jî bi hasilat û eşyayên ditir re diguherîn, bi taybetî bi perçe, şekir û çeka diguhartin, bê minet vedigeriyan malên xwe. Gelek caran Kurda eşyayên xwe di malên wan de dihiştin û diçûn, Ermeniya xwe bi xwe wan difrotin, paşî wextekê, wextê wan Kurdê dostê wan bihata, wê heqê wan bidana.

Di bajarê Diyarbekirê, Erzürümê, Wanê û çend bajarên mayîn de her wekî kirin-firotinê deranîna cure cure eşya jî di destê Ermeniya de bû, lê kirin-firota heywanê û hasilata wê di esasî de di destê Kurda de bû.

Her tenê li bajarê Wanê, di sala 1910-an de 152 destçexanê (degezane) malan ên deranîna perçe hebûn, ku wan perçên jî pembû û ris ên gelekî zexm û bedew dihatin. Di nav wan de jî bi taybetî

''Perçên Çataxê'' û ''Mansûê'' berbiçav bûn. Wekî Ermeniya Kurda jî wan ji bo enteriya, pišta bişmêta, mala û rûyê nivîna dikirin. Ji bîlî vê yekê di bajêr de 18 destçexanên ku perçên ''Namazlik'' ber didan, hebûn. Ev perçe hanê bi piranî musulmana dikirin, ku ji bo wextê limêjê bavêjin ber xwe.(11)

Kurda heywanê û hasilata wê derdixistin firotinê. Kurda heywanetên xwe ne ku di cî de difrotin, her wiha dibirin Sûriyê, Stembûlê û hêla Misrê jî.(12)

Di nabêna Ermeniya û Kurda de her ûsa di qeza Besênê de jî kirin-firota bi firetî dihat kirin, Ermeniya hûr-mûr û perçe dibirin nava Kurda, Kurda jî bi piranî cure-cure fêkî dibirin gundên Ermeniya, çimkî wan gundên ku Kurd tê de diman çiya û derûdorên wan bi dar û berên gur ve hatibûn girtin û fêkiyên rind digihîştin. Kurda wan berev dikirin selikan, çewalan û xurcîna ga bar dikirin û dibirin gundên Ermeniya.(13)

Divê bê gotinê, ku kirin-firota roj bi roj hevkarîya wan herdu civakan tekûz dikir. Di nava wan de peywendiyên çekdarkirinê pêş-de dianî. Wekî nevîskarê Ermeniya yê bi navûdeng Raffî dibêje: ''Wê peywendiyê (ya kirin-

firotinê K.Ç.) di nava Ermeniya û çend qebîlên Kurda de baweriyek (ewlekariyekî, amintiyekî) mezin çekiribû, çiqas Tirka zor didan wan, ew dostanî tekûztir dibû.''(14)

Peywendiyên civaka Ermeniya û Kurda yên kirin-firotinê, li qeza Çarsenzaqê jî ber bi çav diket, ku li vê derê Kurda bi piranî çek ji Ermeniya dikirin; vê yekê bi dizî dihat kirin, Hukumeta Tirkiyê eger bi vê yekê bihesiya, wê malên Ermeniya jî binê ve bişewitandana. Ermeniya vê yekê rind zanibûn lê ji vê yekê xwe paşde nedidan, alîkarî didan Kurda. Herwekî nivîskar û edebiyatzanê Ermeniya Toras Azatyan dinivîse: ''Di Çarsenzaqê de çakmaksazî (çek çekirin) gelekî pêşde çûbû, hemû şûr û tivingên Kurdên Dêrsimê, Ermeniya çedikir, divê bê gotin, ku çekên Ermeniya jî hebûn.''(15)

Tevgirêdana Kurdê Dêrsimê û Ermeniyên qeza Çarsenzaqê ya kirin-firotinê, piranî di rojên aşitî de pêşde diçû, bi taybetî jî, gava ku hucûma eskerên Tirkiyê ji ser Dêrsimê dihat sekinandin wê wextê, wekî tê gotin dest bi meşa wan a kirin-firotinê dibû. Kurd jî çiya dadiketin, diçûn cem dostên xwe yên Ermenî, kirin-firota xwe dikirin. Ermenî jî ji bo kirin-

firotinê ji bal xwe ve diçûn çiyayên Dêrsimê.(16) Ew li wir her ûsa bi seneetkarî ve jî mijûl dibûn. Wekî nivîskarekî Ermenî jî dibêje: ''Dêrsimîya bi hub û hezkirinek mezin ve ber bi Ermeniya ve diçûn û gelekî bawerîya xwe bi wan dianîn. Temamiya kirin-firota xwe bi Ermeniyên re dikirin... Ermeniyên tucar û sineetkar 3-4 mehan her tim li çiyayên Dêrsimê, li gundên mezin û biçûk digeriyan, bi azayî û bê minetî bi şixulê xwe ve mijûl dibûn.''(17)

Di nava Ermeniyên Çarsenzaqê, Kurd û Ermeniyên Dêrsimê, Muksê de têkiliyên dostaniyê ûsa hatibûn çekirinê, ku ew diçûn malên hevûdu, bê pere çî ku ji wan re lazim bûna dikaribûn bibirana, yan jî Ermeniyên eşyayê xwe dibirin cem Kurda bi heywanet re diguherîn, lê heywanet nedianîn, li cem dostê xwe yê Kurd dihişt da ku wan xwedî bike, paşî kengî lazim be bide wan.(18)

Tu şik tune, ku van têkiliyên han ên kirin-firotinê û tevgerêdana van herdu civakan a sineetkariyê tesîreke xwe yî qenc li ser rewşa wan a sosyal-ekonomîkî û tekûzkirina hevkarîya wan hişt.

(Döm dike)

LÊKOLÎN Û ENCAM

''Ger û Geşte Li Navçên Kurdistan''

Nivîskar : Leylan

Nasandin û rexne : Ebdurreqîp Yusuf

Ev kitêba han a Kurdî, ji 10 rûpelan pêkhatiye û sala 1984'an li Silêmaniyê, di Çapxana Serkevtin de hatiye çap kirin.

Nivîskara kitêbê xuşka Leylan (Şefîqe Elî) e. Nivîskareke Kurd a ji xelkê Silêmaniyê ye. Her çiqas xuşka Leylan helbestvan e jî, lê bes bi helbestvaniyê nesekiniye, qîmet daye hinek warên din jî. Li gor bîr û bawerîya wê hewcedariyek mezin jî jindarkirina dîrok û kelepûrên havçerxî yên Kurdî heye û eva han jî li ser milê hemû rewşên bîrên Kurdî wezîfeke mezin dizane.

Kitêba Ger û Geşte Li Navçên Kurdistanê (Gul Geşte Be Nawçekanî Kurdistan de), ji 39 çavkaniyan pêk hatiye û li ser van mijarên han sekiniye: Şarezor, Adiyeman, Bedlîs, Silêmanî, Darbîn, Laleş û Kufri.

Nivîskar bi awakî kurt û rewan li ser dîroka van cî û bajêrên Kurdistanê disekine, bi awakî şarezayî agahdariyan derbarê wan de berpeş dike. Mirov bi xwendina wê, aciz nabe, ji ber ku mijarek gelek xweş e.

Ciyê şanaziye ye ku jinek Kurd

bi vî awayî rûmet bide dîrok û şunewaran (esera) û têkeve nav babetek wiha zehmet.


Hinek nêrînen min di derbarê vê kitêbê de hene, ez dixwazim wan tîxim ber çavên xwendevanan...

1- Di rûpelê 15'an de tîgotin ku Medî di dema Hamurrabî de bûne. Eva han xelet e. Ji ber ku dewra Hamurrabî di salên 1792-1750 yê pêşî Îsa bûye û Medî ya dawîya sedsala heştan an jî destpêka sedsala heftan a pêşî Îsa geheştine Şarezor.

2- Di rûpelê 16'an de, tîgotin ku Medî û Lolo havçerxî bûne. Loma jî tîgotin, ku Loloyan, piştî Medan hukum li Şarezor kirine. Lê rastiya vê eve ku Loloyî gelek sal berî Medîyan bûn û berî Îsa bi sê hezar sal deng û behsên Loloyan hatiye.

3- Di rûpelê 16'an de, tîgotin ku di wextê Abbasiyan de Xozistan her Şarezor dihat hesabandin. Ez vê yekê rast nabînim. Ez dibêim qey vê yeka han jî dîroknivîsê Kurd ê xwelî xweş, Huseyn Huznî Mukriyanî wergirtiye.

4- Di rûpelê 18'an de, hatiye nivîsin ku Mensurê kurê Nîza-



Ruyê pere

Pišta pere


meddîne Şahê Dewleta Dostkî ya Kurdî, bi destê Tirkan hatiye kuştin. Lê belê, ya di sala 486'ê hicrî (1094 z.) yan jî di sala 489'ê hicrî (1097 z.) de di maleke yekî cuhu de li bajarê Cizîra Botan koça dawî kiriyê. Ji ber ku di wê malê de ji bal Cîgermiş ê ku karbidestê Selçûkiyan bû, hatiye bendî kirin. Ji bo agahdariyan li kitêba min a han binêre: El-Dewle el-Dostikiyye Fi Kurdistan El-Wusta (Di Kurdistan Dewra Navinde Dewleta Dostikiyan) cildê yekem, rûpel 339.

5- Rûpelê 18'an: Peyva Sosan bi navê Qubat re nehatiye. Li wê kitêba me ya navê wê da (B-1

r.339) binêrin.
6- Rûpelê 20'an: Ew çiyayê ku di sala 1441'an de volkan jê derketiye, Nemird (Nemrud) ê rojhilat e ku li rojhilatê Bedlîsê û nêzîkî qeraxê Deryaça Wanê (Gola Wanê- NM.) ye. Ne çiyayê Nemird (Nemrud) ê rojavayê bajarê Adiyamanê ye, ku heykel li wir hene.

7- Rûpelê 23: Dicle ne ji navça Bedlîsê, ji bakurê Diyarbekrê derdikeve. Ji milê rojhilatê wê re Ava Botan tê gotin û eva han jî ji çiyayên Mikis û Hekarîyê derdikeve. Ev her du şetên han li aliye din li Tila nav rûwa tevîhev dibin.
8- Rûpelê 23: Mecîd Weldîn

Bîranînen Generalekî Tirk



Cemal Madanoğlu
Wergêr : Alîşer

-3-

Uzir: Xwendevanên hêja, di hejmara me ya berê de jî ber şaşitiya raxistinê, perçakî mezin ji ''Bîranînan'' nehatiye çapkirin. Loma di vê hejmarê de jî ciyê qutbûyî, em jî nuh ve çapdikin û hêvî dikin ku xwendevan me bibexşînin.

ARMANÇ

Piştî ku me pênc' deqîqan rê domand, min lê nêrî, di pêş de çarpênc mirovên fistan sipî. Bi nêzîkbûna kamyonê ve xwestir hatin xuyakirin. Mirov bi çek in. Em hinek din nêzî wan bûn. Ez bi ser bînbaşî de fetilim:

-Ev kî ne bînbaşiyê (sergurd) min?

Deng tune.

Lê bînbaşî şewqa xwe jî serê xwe derxistibû; bersiv neda min û bi ser şofêr de zivirî:

-Pê lêke... got.

Mirov di nîveka rê de sekinîne. Qet xwe nadin alîkî. Rê, rîya Mirdîn-Cizîrê ye. Mirovan ku xwe nedan alîkî, kamyonê meşa xwe sivik kir û gir û gir li ber wan sekinî.

Di wê navê re, min li paşîya xwe dengê seh kir:

-Aaaaay...

Di dawiyê de jinek ji hişê xwe çûye û ji tu kesî deng dernayê. Min li wan kesên rêbir nêrî, li ser wan hem tiving hem jî devançe heye... Rextên gulên wan di ser herdu milên wan re bi berjêr aliqiyê. Ji bîlî vê, li pišta wan jî rext heye; piraniya wan bi dûrbîn... Yekê di nava wan de, piçek li pêş sekinîye. Simbêlekî wî yê sipî û sor û dirêj heye. Bi ber hejina bayê, simbêlê wî dilîzin. Ew mirovê bi simbêl, bi şofêr re hinek tiştan axift. Şofêr bersiv van dayê. Piştî re şofêr ber bi aliye min de hat û derî vekir.

Ez bêdeng disekinim.

Mirov, bi awakî giramî silav da. Bangî yên rexê xwe kir. Di wan de du kes bi alîkî de banzdan.

Ê bi simbêl, gurr dest danî ser hev û bi wî awayî li ser piya ma. Em jî li ciyê xwe rûniştine.

-Bê dengî...

Mirovên çûbûn, dawiyê hatin.

Di destên wan de, dirêjahîya wan bihust û niv du bihust gûşiyên tîrî yên mezin. Mirovê simbêlsor, çar gûşiyên tîrî stand û pêşî yekî danî pêşa min piştî re yê diduyan û sisiyan û yê çaran...

Gûşiyê pêşîn dest bi perçiqînê kir. Di piyê min de, cizmekî jî çerme glasê, pir paqij û temîz, bi qûmaşê lastîkotî, pantorekî kuloş. Ava tiriyan destpêkir û derbaşî pantor bû.

Piştî re mirovê simbêlsor ji erdê silavek da û derî girt û me bi rê xist.

Wextê kamyonê dest bi çûnê kir, min jî şofêr pirsî:

-Ev çiyê lo?

Nabêjî, ku ev mirov serokê Êzîdîyan bûye.

Navê wî Şemon bûye.

Şemon, bûyera ku rojek berê bûye, seh kiriye. Telgrafekî şandiyê Enqerê. Gotiye, ''Ji vir pê de ev riyên han ji min tîrî pîrskirin'' û bi mirovên xwe ve derketiye aramiya rê. Wextê ew, min bi uniforma serbaziyê ve dibîne, wek sembola otorîta dewletê bi giramî pêşkêşiyê dike. Piştî çend kilomêtran me tiriyan avêt. Min ser û piyên xwe paqij kir, lê pantorê min şil û şepal e. Pîreka dawiyê ku ji hişê xwe çûyî me bihiş kir, ev pîreka begê me bû ye.

Dom dike

Muhammed El-Dîn hatiye nivîsandin, ji vê meksed, Mecîd El-Dînê Firuz Ebodî ye.

9- Rûpel 30: Nivîskara kitêbê nivîsandiye ku ji Mîrên Bedlîsiyan 22'ê wan hukumranî kirine û bi navê xwe sîke lê dane.

Li gor Şerefxanê dîroknivîsê xwediyê Şerefxanê, 24 kes ji Mîrên Bedlîsê hukumraniyê kirine. Yê yekemîn Mîr İzzeddîn e... Navên 43 mîrên piştî Şerefxan li ba min hene. Eva han jî çend sal berî niha, min ji ba Adil Şerefxanê berêz aniye. Ew bi xwe di warê dîroka Mîrên Bedlîsê de mirovekî gelek şarezaya ye. Sala 1977'an, ku ez çûbûme Bedlîsê min wî dit. Piştî wê min çend name jê re şandin û daxwaz kir ku navên Mîrên Bedlîsê yên piştî Şerefxan ên di çavkaniyan de nînin kom bike. Ew jî duşê salan di mijûliya peydakirina wan de bû û dawiyê min wan navan da anîn. Her wiha min dest bi nivîsandina kîtibekê li ser dîroka Bedlîsê kiriyê.

Li ser Mîrên Bedlîsê û perên wan, xuşka Leylan nivîsandiye ku hemûyan sîke lê dane. Tiştê heta

niha tê zanîn, sîka çar mîran hebûye: Mehemedê kurê Şerefxanê, Şerefxanê kurê Mehemed. Perên wan her du mîran di muzexana Bîranya de hene. (Wek evê han wêneyê yekî ji wan e. Li ser rû û pišta wî van nivîsandinên han hene):

Li ser rûyê pere wiha hatiye nivîsandin:

''El-Wasîq Bissemmed Şerefxan Bîn Muhammed Derb Bedlîs''

Li ser pišta pere jî wiha hatiye nivîsandin:

''Lailahillellah Muhammed Resulullah Derb Bedlîs''.

En dawî Şemseddînê kurê Dîyaeddîn (Zîyaeddîn-NM) El-Ruşkî û İbrahîmê kurê Hacı Muhammed in perê yê çaran di Muzexana İstênbol de heye. Wênen çend nimûneyên wan peran li ba min in û her wiha nimûneyek jî wan a jîndar min ji Bedlîsê anî, niha li El-Muessese El-Amme lîl Asar (Binyata Şunewarên Giştî), di bin reqema 24227'an de hatiye qeyd kirin.

Dûmahîk r. 7

Nameyek ji bo yara min

JI XEMÊN DU HELBESTAN

Viyana dîtina te, piştî ku min piştî xwe da warê xwe û ez bûm rêwiyê biyanîciha, bû xencerek û bêriya te li kûratiya dil kola... Xweşiyar bar kir, dilanên me tev mişext(mihacir) bûn, çîqa li dût çûm, min nezanî kanî li ku akincî(cîwar) bûn!? Kêf û ken, wekû kulîkên adarê bi lez behîn(zer bûn), min hêz nema li benda bihareke din bim... Kovan, nizamî cara çendan e, ji serî ta bigihe pehniyên piya, laş bi carekê de bi derdan hunîn (seyand)... Hemû caran, dafik û torên şeva dîlkuj digel tîrêjên civanrojê, ez jî daqurtandim, li nav tariya bêdawî, li benda stêrka sibehê me, ka dê kengê hilê? Welatê min dê vê rojê dîsa her bi qurbanîya bixemilîne, an jî gelo hevî heye qîtîskek ji ronahiya gelewêja bigihê ser esmanê birçî yê tîrêjan û rojê??

Ma tu dizanî, caran tê bîra min ew reşşeva ku min xatir xwest ji çavên te, bi vî dilê wiha birîndar her du rûyên te maçî kir... Ku peyv di qirika min de xeniqîn, çîqas hatim, deng ji esman derneket... Li ber wê ketim ku min pexşanek nevehand (nehûnand) ji ciwaniya keskatîya baharên tê... Helbestek, ji rengê evîna Bedîrxan min nemeyand, hêvênê wê ji kavilê dîwarên gundên me... An jî welat, min nezanî, bîrîkên xwe tîjî bikim ji axa te, da van rojên wiha bi êş û jan, wekû Memê destên xwe li ser porê Zîne bigerînim, bîrîna dil pê derman kim...

Hinek caran, dema dizivirim malê, laşê min giran, mîjîyê min westiyayî, dil şikestî, çav serxweşên dîtina te, raman û bir req radiwestin, ji bo dîtina çîrîskêkê di nav tarîstaniyê de... Paşê wilo ez paldidim ser cihê xwe, ji bêdestî çav diçin ser hev, bîrhatina hêdî hêdî û kitkîte dixim riskê,

dikevim nav derya xem û xiyalan, wekî pepûka birawind dûr dûr difirim... Têm ser esmanê "kevnewarî", li agirên serê çîya, li şivanên xemla şevê dibim mêvan, di nav mîja kopên çîya de, di gel serma çîlên dirêj li ber agirê darikan û çîlo dikevim xewên şikeftan... Xwendîngehan ez dibînim, di şûna yarî û kenîna zarokan de govenda kund û bûma ye. Li şunwarên rezên tîrî, darsîmaqan sîhên tîrşatiyê vedane... Ez diwestim ji rêveçûnê, bêhnê vedidim li raser ava Dîcle û Xabûr. Xuşîna wan, dikim avaz ji bo helbestên Kamûraniyê... Paşê, şengê, ji nişki ve vedicîniqim, çavan bel dikim, li oda fireh, evî zîre-bajarê han, dilê min teng, kezêba min xwêdan-girtî ji ber êşa dûtariyê... Na cana min, nakim girî, lê belê pê dihesim kelegirî dikeve dilî, bişkurînek ji çêrondikan ji nav lêvên min dibîşkivê.

Nebêje ji min re. Ez dizanim li warê min kêf û xweşî mitayên (malên, tiştên) qaçax in. Hemî deman reşek û rêgirên şevan li ber rêkan, li hawîr gundan kenîyan diçînin... Li firoşgehên gurên har, roviyên sêşevî, bi erzanî xwîn û rondikan difroşin. Esmânê me sincîriye, teyr û tîlûrên ji hesin her sibehê şînî û taziya dibarînin da ku dayîkên me xurîniya xemên giran pê bişkênin. Ji ber şahiya çîleçîlan(şebşebokan) bûkên me her "ji ber davêjin", li hizreta şevên tenane. Pîrejî li nav şînorên me bi teşîkên dara jînê, kul û kovana dirêsin... Ne bes zarok, lê navser û kalên me jî digel balefîran "çavbelanê" dilîzin... Ez dizanim mişextên me boş (pir) in, guhên zarokên xwe kerr dikin ji çîrokên şîrîniya ciwanwarî, heviya wan nevemirîye. Her ku rojek ava dibe diçe

xwarê, çavên wan bel ji bo dîtina hilatîna rojêke tîjî ronahî ku rêka zivîrînê ronî dike. Ez dizanim gelek rojan pêşmergên me li ser termê tîjîşêrekê bi kerb û kîna xwe dihisin. Li pişt dîwarên pîrî qûm û pîrî hesin, li qulaçêke zindanê girtiyên Kurd, bi awir û berxwedanan, gulê avdidin. Erê erê ez dizanim, me girîna sêwiyan kiriye stiran û bi awazên wan savayên (biçûkên ber şîr) me bi xew ve çûne.

Ez dibînim, gelek mirov bi ereqê, hinek bi gilasek wîskî serxweş dibin, kul û kovana hildikolin, xema dixwin. Lê ez canê, dema parçe helbestekê bixwînim ku bêhna axa şewitî jê bê har û gêj im, an jî dilê girîna biçûkê sava bibihîzim, bîra dengê gulle-topa tê civata mejiyê min, guhderiya stranekê bikim ku behsa evîniya welat bike, ez sergerdan wekû zarokeke bêdê pêngav pêngav kolanên bajar dipîvim. Bawer bike canê gava ristekê bixwînim ji xwegorîkirina an nalîna birîndarekî bê guhê min, hêza hêdara vîna min çik dibe û qêriyên dilê min ê jar gazî dike:

Bila, bila bes bizanin, bes bizanin, zarokên me hîni avakîrîna xaniyan û barkîrîna dewaran bûn, rojnamên me bê nûçe û deng û basên tal silava li rojê nakin.

Dergistiyên me êş in, jan in, derd û xem in.

Next û qelen xwîna sor e serê me ne. Lê bilanê, ji evan bav û ji evan dayikan, dê her zêtir

Kulîkên kesk û sor û zer roja heviyan bidîrîne şevê û tariyan û hilîne ser.

S. Rêwî

HINDIK

RINDIK

BERTÎL ÇAWA TÊ XWARIN?

Di van rojên dawî de li Tirkiyê gelek bertîl tî xwarin. Navê gelek bertîlxwarên gire-gir ji hat eşkerîkirin. Di nav van kesan de serok û hevalbendên cûntayê serî kişandin. Vê yekê jî hemû kesên bertîlxur tirsand û aciz kir. Lê belê acizbûnê tu tişt safî nedikir, dibê ji xwe re hin tedbir bigirtana. Û girtin jî.



Dibêjin piştî eşkerebûna bertîlgirtina general Tahsîn Şahînkaya (Kumandarê Giştî yê Hêzên Hewayî yê berê û endamê cûntayê yê îro) hemû bertîlxurên mezin -ku van kesana tu carî perê hindik nagirin yanî devê tevî hawûtî diwin- konferansêk istîsnayî(!) çêkirin. Konferans li ser du nuxtan sekîni: Ji bo çî bertîlxuriya Tahsîn Şahînkaya derket meydanê û bertîl çawa tê xwarin? Li ser nuxta yekem hemû kes li hev kir ku, mesele ji ber hin nezaniyên xwarina bertîlê, eşkere buye. Îcar ji bo ku kesên bertîlxur carek din kêmasiyek wisa nekin, piştî "konferansa bertîla" di rojnamên Tirkiyê de nivîsek bi navê "bertîl çawa tê xwarin?" hat weşandin. Me, nivîsê pîrr enteresant dît, loma jî em wê li jêr pêşkêşî xwendevanên xwe dikin.

Bertîl Çawa Tê Xwarin?

1- Bi destê rastê tê xwarin...û

bi destê çepê jî çinik (sênik) tê girtin.

2- Bi devlikenî tê xwarin. Gava bi murûzekî tal bê xwarin, wê gavê jî ew kesê ku bertîlê dide dikare xwe bitertîline (şaş bike).

3- Bertîl zû tê xwarin... wexta bê payin, wê him sar bibe û him jî karekî wisa li dijî felsefa Ozal ya bertîlxurîne ye.

4- Bertîl bê dudilî (bê teredut) tê xwarin. Dema du dilî bê kirin, yekî din dikare xwe çîndke ser û bibêje lûûtûp û bavêje devê xwe.

5- Tê bilindkirin û li texma çengoyê tê xwarin. Lê dema çengo zirav be û dev jî wek bizmîka biçûk be, wê çaxê bertîl jî kêm dibe. Loma jî, dibê heta ji meriv bê meriv wek barçemka (şebşebokan) devê xwe jihevke.

6- Bertîl bê fedî û bê tîrs tê xwarin... Ma gelo wê ji çî bê tîrsin û fedîkirin?

ÇÎROKÊN STRANAN

M. Şerwan

Her çend dawet, şabî û kêfxweşî be jî, di nav me Kurdan de, di dawetan de ne tenê rojên kêfxweşî derbasbûyî di bîr tînin. Li ber govendan stiranên wan rojên nexweş jî tînin gotin û li ber direqîsin.

Ev çîroka kurt jî ji wan rojên nexweş hatiye û beta îro jî tê gotin.

MOMINÊ

Mominê kiçek çarde-panzde salî bû. Navteng zirav, çîlî-çavreş bû. Keziyê xwe yê vehandî bi ser milê xwe ve berdida. Hin xweşkok bû, mirov qîme nedikir berê xwe bidetê. Gelek caran fistanek bervekirî û gulî sor li xwe dikir. Di bin fistanê de jî kirasek pembe berdikir û suçêkê kirasî bi yêkûdu ve girêdida û tavête ser milê xwe. Axirî serê we naêşînim gelek heşxwekirî bû.

Mominê, hero çaxê danê pezi, meşka şîrî tîdiki pazîne xwe û li gel bîrvanên diçû bîriyê. Li ber bîriyê, peze xwe tîna ber destê şivanî, ca şivan bidoşit.

Rojekê ji nav rojan, miheke Mominê berxikêk za. Lê belê mihê netêla berxik guhanê wê bimêjît. Çaxê berxik diçû ber guhanê maka xwe, maka wê pêhn lê dida. Ji ber vê çendê, Mominê hero çaxê tate bîrê, bi dizî ve berxik dida ber pîstanê(memîkê) xwe, da ku berxik pîstanê wê bimêjît. Heyamek ser ve çû, pîstnê Mominê mezin bûn û şîr jê hat.

Bêrvanê gundî pêhesiyar ku şîr ji pîstanê Mominê têt. Û gundiyan belav kirin ku Mominê li gel şivanan rabû û runîştîye. Ev xebere çû guhê mala Mominê jî.

Mominê sê bira û dayikek hebû. Mal, ber vê meselê bû du ker (bir). Dayik û birayê biçûk digotin:

"Mominê tiştê wehe naket, bîrvan û gundî derewan dikin". Bes her dî birayên mezin digotin: "Hebît-nebît Mominê li gel şivanan rabû û runîştîye, ber hindê ji pîstanên wê şîr tê, gerek em Mominê bikujin".

Têkiliyê Mominê li gel şivanan nebû. Yanî xwe dest şivanan ne berda bû. Lê belê em çî bikin bi sexmerata bêbextiya bîrvanên Mominê tete kuştin.

Vê ca em dê nehe guhdariya stîrana diya Mominê li ser Mominê gotî, bikin.

Mominê hede hede, Moma dayê Mominê hede hede gana dayê.

Bêriyan çî kul û derde Moma dayê Bêriyan çî kul û derde gana dayê.

Şertê birangê mezin e, Moma dayê Şertê birangê mezin e, gana dayê

Sund xarî mal û jine, Moma dayê Sund xarî mal û jine, gana dayê


Dê Mome bikujine, Moma dayê Dê Mome bikujine, gana dayê

Şertê birangê biçûk e, Moma dayê Şertê birangê biçûk e, gana dayê.

Sund xarî mal û sîke, Moma dayê Sund xarî mal û sîke, gana dayê

Dê Mome bikeyne bûk e, Moma dayê Dê Mome bikeyne bûk e, gana dayê

DI DÎROKA ME DE EV MEH



Yilmaz Güney bi preka xwe re

3 Îlon 1967: Li Diyarbekir bi navê "Dogu Mitîngleri -Mitîngên Rojhilat-" mitîngêk çêbû.

3 Îlon 1982: Komelên Karkerên Demokratên Kurdistan (KKDK) bûn federasyon.

4 Îlon 1919: Komcivîna Sêwazê bi serokatiya Kemal Atatürk çêbû. Armançek vê civînê jî ew bû ku tevgera Kurd bipelçiqîne.

5 Îlon 1937: Serokê Serhildana Dêrsimê Seyîd Rîza ji alî leşkerên Tirk ve li Erzîncanê hat girtin.

6 Îlon 1930: Serhildana Şêx Mahmûd a Sisiya destpêkir. Gel li Sulêmaniye serhilda.

7 Îlon 1930: Jenosîda Agirîyê a Sisiyan destpêkir.

8 Îlon 1920: Serhildana Îbrahîm Paşa yê Millî tîkçû.

8 Îlon 1980: Kovara mamosteyên Kurd bi navê "Demokratik Egitime Dogru -Ber bi Hîndekariya Demokratîk ve-" derket.

9 Îlon 1869: Rewşenbîrekî Kurd Abdullah Cevdet li Arapgîrê hat dinê.

9 Îlon 1961: Abulkerîm Qasim piştî derba 1958'an wê soza ku di derheq mafên muxtariyeta Kurdan de dabû, ne anî çî. Lê ser vê, gelê Kurd nerazîbûna xwe diyar kir. Di vê tarîxê de A.Qasim leşkerek giran şand ser Kurdistanê.

9 Îlon 1984: Nivîskar û hunermendê mezin û welatparêz Yilmaz Güney mir.

11 Îlon 1961: Di bin serokatiya Mele Mustefa Barzanî de destpêkirina tîkoşîna netewî ya çekdar li Kurdistanê Iraqê.

12 Îlon 1924: Serhildana Nastûriyan.

13 Îlon 1927: Serhildana Agirîyê ya Duduyan.

14 Îlon 1929: Hereketa Tendûrek.

15 Îlon 1914: Nivîskarê Kurd Hesên Qizilçî li gun-

dekî navbera Bûkan û Mahabadê hat dinê.

16 Îlon 1942: Li Mahabadê "Komela Jiyanewey Kurdistan" hat damezrandin.

16 Îlon 1983: Endamê Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan (PPKK) ê Azad (M.Nûrî Madak) di şerê bi leşkerên Tirk re hat şehîd kirin. Ew jî Cizîrê bû.

19 Îlon 1965: Leşkerên Iraqî 67 Kurd li gundê Dukan di agir de şewitandin.

27 Îlon 1618: Şerê navbera Osmanî û Farisan bi peymanekê sekîni. Li gor vê peymanê Osmaniya 10 hezar Kurd wê bidana Farisan.

28 Îlon 1977: Cara yekemîn li Kurdistanê rêxistinêk merkezi a ciwana bi navê DDKD hate damezrandin.

30 Îlon 1922: Li ser daxwaza Îngilîz û Tirkan ku her duyan jî dixwestin bidin îspatkirin ku Mûsil ya wan e, li ser navê Konseya Cemiyeta Milletan heyetê çû Mûsilê ziyaret kir. Li gor rapora wê heyetê piraniya xelkê Mûsilê ne Tirk û ne jî Ereb, Kurd in.

Îlon 1937: Generalekî Kurd bi navê Bekîr Sitqî teşebuşî derbeke eskerî kir li Iraqê, lê biserneket. Salek şûn de jî hat kuştin.

Îlon 1955: Eşîra Ciwanro li Kurdistanê Iraqê muxtariyeta xwe îlan kir.

Îlon 1976: Rêxistina Kawa li Kurdistanê Tirkiyê hat damezrandin.

Destpêk r. 1

Lîbya û Îranê êrîş rûreşkirin

Êrîşa Ordiya Tirk a ser gelê Kurd ê bêguneh ê Kurdistana Iraqê, nerazîbûn û protestoyên raya giştî ya cîhanê û hêzên aşîtxwaz û demokratên cîhanî bi ser xwe ve kişand.

Nerazîbûna xurttirîn ji bal Serakê Cemahîriya Lîbya albay (eqîd) Muammer Kaddafî hat diyarkirin. Li gor jimara 20'ê Tebaxa 1986'ya rojnama Cumhuriyetê (ku li Tirkîyê derdikeve), ji BBC neqil-kiriye Serok Kaddafî ji Serokkomar û Serkwezîrê Tirkîyê re mesajek rêkir ku tê de êrîşa Tirkîyê ya ser Kurdan wek êrîşa Siyonîstan û ya rejîma nijadperest a Afrika Başûr dihesibîne. Mesaja Serokê Lîbya ev e:

"Operasyona ji bal Hêzên Hewayî yê Tirkîyê pêkhatî, ku armanca wê di nav erdên Iraqê' de takîpkirin û kuştina Kurda ye, karekî wilo ye ku bi tu awayî nabe ku ji bal me ve bê qebûlkirin.

Hemû gelên cîhanê vê operasyonê red û rûreşdikin. Çunkî ev kar, karekî îmhakirinê ye. Ji alî din ve, di encama operasyonê de, qesebe û gundên Kurdan hatine hilweşandin, jin û zarokên wan hatine kuştin. Her wekî gelê Ereb û Afrika ku ji bal siyonîstan û rejîma nijadperest a Afrika Başûr ve tîm îmhakirin.

Kurd ji alîkî de, endamên hêzên şoreşgerên Kumandariya Yekîtiya Ereba ne, ji alîkî din de ji milletekî wilo ne ku mafê wan heye ku di nav yekîtiyê serxwebûnê de bijîn û divê îhtîrama vi mafê wan bê kirin.

Kurd, birayê milletên Tirk, Ereb û Faris in û bêparhiştina wan



ji mafên azadî yê millî, zirarê dide yekîtiya me Ereban. Înkarkirina azadiyên me radiweste. Û min hiddetek mezin hiskir li hember vî karê ku ez hêvîdarim wê carek din tekrar nabe.

Her çîqas ji bal hin kesan ve hin sûcên adi hatibin kirin jî, bêmanîtiyê gava li hember vê yekê bersîvek wiha bê dayin. Ji alî din, ez gelekî xemgîn dibim ku hukumeta Tirk, buye alatê feqîka hukumeta Iraqê ya ku li hember birayên me yê Kurd vedaye. Ev rewşek fedîkarî ye, û şîrkatiya sûcekî nedîtî ye ku bi hukumeta Iraqê re hatiye çekirin."

ÎRAN

Ji welatên ku li dijî êrîşa Ordiya Tirk nerazîbûna xwe nîşandan yek jê jî Îran bû. Wezareta Karûbarê Derve yê Cumhuriya Îslamî ya Îranê di beyana xwe de wiha got: "Tirkîye, divê operasyona xwe ya Bakurê Iraqê di kurttirîn dem de rawestîne û eskerê xwe peşde vekîşîne. Teyarên Tirkîyê, li Iraqê, herêmên Kurdan bombaran kirine. Vê êrîşa hewayî ku ji bal Tirkîyê hatiye kirin û operasyonên wê, him me xemgîn dîke him jî rehetî û emniyeta me xeradîke. Karên wiha serbixweyîyê jî tehrîb dîke. Bi vê êrîşê, desîrêjîya karê hundur ê Iraqê buye. Li hember vê êrîşa ser Kurdên Bakurê Iraqê ku li dijî Seddam şerdikî em nikarin temaşedar bimînin. Tirkîye bira nebe bend li ber xebata Kurdên Mucahid ên musulman ku li dijî Seddam şerdikî. Em buyerê rûreşdikin."

PARTIYÊN EREB

Partiyên Komunîst û hêzên rizgarîxwaz ên niştîmanîyên Ereb li Şamê, bi hev re beyanek derxistin, rûreşîya Tirkên faşîst raxistin ber çavan û piştgiirî û hevkarîya xwe bi gelê Kurd û hêzên niştîmanperwer ên Iraqê re dan xuyakirin.

Herwiha, dan xuyakirin ku rûmetek bilind didin mewqîfê Muammer Qaddafî Serokê Cemahîriya Lîbya yê li hember vê êrîşa har. Partî û hêzên ku beyan derxistin ev in: Cepha Gelêrî ya Rizgariya Filistin, Cepha Gelêrî ya Bahreyn, Yekîtiya Niştîmanperwerên Misrî li Derve yê Welat, Cepha 13'ê Hezîranê a Hêzên Gelêrî yê Yemenê, Rêxistina Cepha Demokratî ya Urdun, Partiya Komunîst a Urdun, Cepha Gelêrî ya Rizgariya Umman, Partiya Komunîsta a Misrê, Cepha Têkoşîna Gelê Filistin, Cepha Rizgariya Niştîmanî ya Behreyn, Partiya Komunîst a Filistin (Komîta Muweqet), Cepha Gelêrî ya Rizgariya Filistin (Qumandariya Giştî), Cepha Demokratîk ya Rizgariya Filistin, Rêxistina Cepha Gelêrî ya Urdunî, Cepha Rizgariya Filistin, Tevgera Rizgariya Niştîmanî ya Filistin (FETEHE).

Leşkerên Tirk di Gundên Uludere de Nêr Nehîştin



Leşkerên Tirk, li Uludere, bi sedan jinên Kurd bê mîr, zarokên Kurd bê bav û dayikên Kurd bê law hiştin.

"Piştî kuştina çend leşkerên Tirkîyê li nêzî gundekî Qulaban (''Uluduru''), leşkeran wekî gurên beratan êrîş birin ser gundên der û doran. Ji van gundan yek jî gundê ''Ballî'' bû. ''Ballî'' gundê herî nêzîkîtirîn e ji ciyê buyerê re. Loma jî êrîşên herî xwinrêj birin ser. Ji heft salîyan berjortir çîqas lawîk û mîr di gund de hebûn hemû keleşçe kirin û birin Sêrtê, dan ber îşkencan û avêtin zindanan. Di nav van girtiyên Kurd de keçikeke 9 salî jî heye.

Leşkerên ordiya dewleta dagirker û faşîst, qîma xwe bi îşkencekirin û bi zindankirina gundiyan Kurd ne anî. Bêderên wan jî şewitandin û zar û zêçê wan bê qût hiştin.

Sucê me tenê bi Kurdî axaftin e.

Di navbera 22 û 25'ê Tebaxê de çend parlementerên Partiya Sosyal Demokrat a Gelêrî (SHP) çûn ve herêma Kurdistanê û bi gundiyan ku zarok û mîrên wan hatine girtin re peyivîn. Li Qulaban, ji gundê Balliyê kalekî 63 salî (Ahmet Varîş) li dijî barbarîyên leşkerên Tirk reaksiyona xwe wisa nîşan da: ''Sucê me tenê bi Kurdî axaftin e. Wekî din tu sîcekî me tune''. Gundiyeke din jî xedarî û xwînxwariya leşkerên Tirk bi van peyvên anî zimên: ''Ki bi suc e bila bê cezakirin, ma ji benderan û ji dar û berê me çî dixwazin''. (Cumhuriyet 26 Tebax).

Li ser hicetkirina kuştina çend leşkeran, êrîşên dewleta Tirk, bi

awakî hovîtî li ser gundên Kurdistanê domdikin. Wek hûn di wênan de jî dibînin, di va êrîşan de gelek Kurdên welatperwer di bin îşkencan de seqet man, gelek jî wan hatin gulebarankirin, gelek jî ji wan winda ne.

Wezîrê Kar û Barê Hundurî, yê Tirkîyê Yildirim Akbulut, armanç û hedefên van êrîşên xwinrêj wisa nîşan dide'', ji bo jî binî ve helkirina vê meselê, çî ji destê me were em teksîr nakin. Divê ev mesele biqede. Ji bo dawîna vî tiştî çî pêwîstbe em dê wê bikin''. (Cumhuriyet 27 Tebax).

Van peyvên Yildirim Akbulut, bi awakî vekirî nîşan didin ku dewleta Tirk qirîkirina gelê Kurd daye pêşîya xwe. Lê dewleta Tirk wê tu carî negihêje vê armanca xwe.

Destpêk r.1

Tirsa Dilê Tirka

Helbet di nehîştina vî karê de Tirkîye yek jî çêtirîn destikan e ku emperyalîzm wan bikarbînin. A di mesela êrîşa Tirkan de, ev hesab û pîlan jî heye.

Sedemêkî din jî yê hundurê Tirkîyê ye. Piştî şeş salên dîktatoriya faşîst îro çî li Kurdistana û çî jî li Tirkîyê be, mixalefetek berfireh li hember dîktatoriya çêbuye. Ji ber destê zulm û zor, îşkence, kuştin û zîndan û ji ber rewşa buhayîyê, bêkarî û birçîbûnê xelk nerazîbûna xwe eşkere dîke. Tevger, xebat, meş û protesto li dijî dîktatoriya çêdibin. Gelek jî hêzên burjuwazî bi xwe jî li dijî dîktatoriya ne. Bertîlxwarin û talankerîya karbidestên dîktatoriya her roj di rûpelên pêşî yê rojnaman de cîh digirin û xelk vê yekê dibînin. Êdî xelk baş tê gihîştine ku ev dîktatorî jî bo çî hat ser hukum. Daxwaza mîletê Kurd û Tirk ew e ku rojekê berî rojekê jî vê dîktatoriya xelasbin.

Dîktatorî jî bi vê erîşa xwe ya nuh dixwaze bala xelkê jî ser xwe bide alî û berê wan bide derek din, da karibe karên xwe yê qirêj veşêre û mixalefê sist û jiyana xwe dirêjtir bike. Ev yeka han jî sedemêkî din a êrîşê ye.

Erê bi kurtî ev in sedemê erîşa Ordiya Tirk a xwînxwar û loma jî bi tank û top û teyaran weka teyrên berata xwe bera ser gund û bajarê me dide. Lê gelo rewşa me Kurdan çîye? Tevgera rizgarîxwaziya Kurd li hember vê xwînrêjî û hovîtîyê çî dîke? Gelo em bi barê ser hustuyê xwe re radibin? Gelek gelek mixabin, vê erîşa dawî carek din xist ber çevan ku, rewşa me Kurdan ne tu rewş e. Gelê Kurd ne firsonêk e. Di şer de mîrxasiya wî nayê înkarkirin, ji bal dinyayê ve jî eyan e. Gelê Kurd, ne gelekî wilo ye ku em bêjin jî bindestiyê razîye, naxwaze bighê serbixweyî û azadiya xwe. Xwedê zane, mîletê me jî bo serxwebûn û azadiyê wek lehîyê xwîna xwe dirijîne. Ên ku bi barê xwe re ranabe ne mîlet e, lê hêzên siyasî yê Kurd in, pêşewayên vî mîletî ne.

Dijmîn êrîş anî ser me, lê me çîkîr? Ji xeynî çend belavok û protestoyan pêştir, ne tişteke jî. Evên han jî piranî ne bi hev re, me her yekî bi serê xwe kir. Di şûna ku em bi dengêkî yekgirtî, gurr û bi hev re em raya giştî ya herêmê û cîhanê bihejin, dengê çend nalîn û gazî-nên nîzm jî devê me derket. Gelo îro, rêxistînek yan otorîtek mîlî jî ku ji tevayîya tevgerên Kurdî pêkhatî hebûna û temsîla mafên mîletê me bikira, bi doza mîlet re rabûna, serî li deriyê komelên navnetewî, hêz û rêxistinên demokrat, pêşverû û mirovperwer xistana, ma wê wiha bûna? Na! Em hamû jî baş pê dizanin ku, emê di qonaxek jî îro çêtir de bûna. Lê hezar mixabin em ne di wê qonaxê de ne, a xerabtir niyeta me jî tune ye ku em xwe bighîninê, yan jî bo wê gava bavêjin.


Lê weha nabe. Bi vê rewşa perçebuyî, bê rêk û pêkî, tevger naçe serî. Qene biravê erîşa dawî, hişê me bîne serê me. Em bi wezîfên xwe re rabin. Riya serfiraziyê çî dixwaze em wê bikin. Ew jî berî her tiştî yekîtiyê ye, hevkarîyê bi rêk û pêk e. Avakirina otorîtek mîlî ya jî hêzên her çar perçên Kurdistanê pêkhatî ye. Da ku karibe jî mîletên cîhanê temsîla mîletê Kurd bike.

"Riya Aştî û Sosyalîzmê" Bi Kurdî jî Dertê

Kovara Informasyonî ya Partiyên Komunîst û yê Krêkar, ''Riya Aştî û Sosyalîzmê, (Rêgî Aştî û Sosyalîzm) jî demekê ve ye, destpêkiriye bi Kurdî jî dertê. Kovar bi Kurmanciya Başûr (Sorani) û bi tîpên Erebî, ji bal Partiya Komunîst a Iraqê ve tê derxistin.

Herçî kovarê dawîya sala 1985 a dest bi weşana xwe ya Kurdî kiriye û heta niha du hejmarên wê derçûne. Hejmaraya yekê di Rezber a 1985 û ya 2 an di Adara 1986 a de derketiye.

Bi vî awayî, dixuyê ku kovar wek çapên zîmanê din ne ji mehê carekê, lê ji 3-4 mehan carekê dertê. Hêviya me ewe ku Kurdiya vê Kova-



ra heja jî pêşkeve, xurt bibe ku karibe jî mehê carekê û bi Kurmanciya Jor û bi tîpên latînî jî derkeve. Navnîşana kovarê ev e:

P.O BOX: 111 Prague 1 Czechlovakia

Bi Kurtî

2 Kîlo Genim Bi Şuşek Kola

Berê me digot ''havîn dema xêr û bêrê ye''. Lê xuya ye ev yek jî êdî di dîrokê de di çirokan de ma. Lewra vê havînê jî ruyê gundiyan ne kenîya û tu xêr û bêr jî keda destê xwe, xwêdana xwe ne girtin. Dan û dexlê wan bi erzanî jî destê wan derdikeve. Gundiye reben ku bixwaze bi şuşek kola tîna xwe bişkîne û piçekî xwe hênîk bike divê du kîlo genim bide. Lewra jî bo şuşek kola divê meriv du kîlo genim bifiroşe.

Darîkekî Kibrîtê Bi 50 Quruşî ye

Hê sala 1978 a jî qutiya kibrîtê ya 40 darîk tê de bûn, bi 50 kuruşî bû. Lê îro li Tirkîyê kibrîtêk bi 20 lîreyî, ango darîkekî kibrîtê bi 50 kuruşî ye. Li gor ku hatiye hesabkirin li Tirkîyê serê meriv rojê 4 darîkan pêdixê, ev dîke salê 1440 darîk. Temamiya welat salê 72 milyar heb darîkên kibrîtê dişewitîne. Buhayê wan darîkan, salê dîke 36 milyar lîreyê Tirkîyê.

Keda Salekê Diçe Ser Sergo

Gava meriv diçe çarşiyê yan halê jî buhayîyê, meriv nikare ji bo şîvekê tîra zarokên xwe, bikire û bibe malê. Kîloya firingiya ji 60-70 lîreyî ne kêmtir e.

Lê li alî din, gava gundî fêkî û dukakên xwe jêdikin dibin cem tucaran, tucar bi qîmetek gelek erzan jî destê wan derdixin. Gundiyeke firingiyê (bacanê sor) xwe

jêkir, li kamyonê kir û bi hêviya bidest xistina keda salekê ber bi bajêr de çû. Lê gava gihast hala dukakan, hevîyên wî hemû li ber bayê çûn. Tu tucarî serê kîloyê jî 5 lîreyî zêdetir nedida. Mîrik jî qehra got: ''Heta ez firingiyên xwe bi 5 lîreyî bifiroşim, hema ezê birjînim ser sorgo, çêtir e''. Keda salekê di nabêna çend deqîqan de çû ser sergo.

Destpêk r. 1

XWÎNXWARIYA ORDIYA TIRK

Tirk(ku du roj berî êrîşê ev yek qewimî bû) nişan da. Îdîa kir ku kesên leşkerên tirk kuştine, ji meqerê pêşmergeyên Kurdistanê Iraqê hatine cardin vegeriyane wan meqeran. Lê piştî beyana Ozal, SHP (Partiya Sosyaldemokrat a Gelêrî) da eşkerekirin ku biryara êrîşa Ordîya Tirk, bê haya parlementoyê ji bal hukumetê ve bi dizî hîn ji 25'ê Tirmehê ve hatiye dayîn. Bi vî awayî durûtî û rûreşîya hukumeta faşîst a Tirk derket meydanê ku mesela kuştina eskerên Tirk ne sedemê esasî lê hiceta (bahana) vê êrîşê bû.

Ordîya Tirk, rojên din jî êrîşa xwe ya ser gundiyan Kurdistanê domandin. Li gor beyana Mesûd Barzanî (Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê Iraqê), di 16 û 17'ê Tebaxê de jî, Ordîya Tirk ji

hewa û ji erdê êrîş birin ser gelek herêmên Kudistanê yê jî bin destê rejîma Iraqî azadkirî. Li gor deng û behsên ku ji herêma şoreşa Kurdistanê Iraqê belavbûn, di encama êrîşa Tirkê de 2 pêşmerge hatin kuştin, lê gelek zîzar gihast gundiyan herêmê, nêz 60 kesî kuştî û rewşa alarmê de ne û xwe hazîrkirine ku li dijî vê erîşê rawestin.

Di dema êrîşê de operasyonên Ordîya Tirk ên li navçên hudûdên Kurdistanê Tirkîyê jî domkirin. Leşkerên Tirk bi komando, tank û singûyan gund û qezên navçaya Hekariyê (Culemêrg) xistin bin postalên xwe, gundiyan civandin birin avêtin zîndanên, bi îşkence, lédan û kuştinê xwestin tirs û xofa xwe têxin dilê wan.

Destpêk r.4

"GER Û GEŞTEK


Li ser alîkî "Derb Bedlîs" û li ser rûyê din nivîsandinek wek tûrayê heye. Muessesa eseran nikaribû bixwîne. Loma jî min şand Muzexana Bîrîtaniya, ba Mamoste xetat Yosev Zalno. (Lê belê wî jî nikaribû bixwîne. Li gor Berêz Adil Şerefxan ev jî ji perê Mirên Bedlîsê ye û jî min re vê yeka han jî got: Makîna sîkan a perên Mirên Bedlîsê li ba me hebû. Lê wextê Rûsan di Şerê Cihanê yê Yekem de Bedlîsê dagîrkirin, ez bawerim ku makîna di wê wextê de wenda bû. Dûr nîne ev nimûnê dawiyê ne ye Şemseddîn Rûşkî, lê ye hinek mîrên piştî Şerefxan bin. Di lêkolînek xwe ya berfirehtir de ezê wan li gel perên hinek mîrên Kurdan ên din belav bikim.

10- Rûpel : Hatîye gotin ku Şerefxanê dîroknivîs pînc medrese ava kirine. Eva han, ji wê kitêba ku me di pêşî de bahs kir, hatîye wergirtin (rûelê 338'an). Bi rastî eva han xelet e. Lê ne xeletîya xuşka Leylan, xeletîya min e. Ji

nê. Niha jî ava ye. Medresa Ixlasiye, tenê avayîya wê 638 m2 ye û min bi xwe pîvaye. Li ser serdera deriyê wê nivîsandiye ku di sala 997'an de hatîye avakirin. Lê belê, di Şerefnamê de hatîye nivîsandin ku di sala 999'an de ava bûye. Ev medresa han gelek delal e. Tirbên birek mîrên Bedlîsê û sê gumbet tê de ne. Di kitêba min a "Geşte-kê Arkeolojî di Kurdistanê Bakur" de, di rûpelên 502-552'an de, bi dirêjayî ez li ser wê medresê û di derheqê Bedlîsê de sekinîme.

11- Rûpel 32: Nivîsiye ku di wextê Abdurrehman Paşa Baban de deriyek hesin ji bo Geliyê Bazîyan yanî ji bo Hafa Deriyê Bazîyan hatîye çêkirin.

Qasî ku min sehkirîye, deriyê gelî dar bûye. Di sala 1912'an de jî ber gelî ketîye alîkî û hinek jî xelkên Kerkûkê derî birine xanek Kerkûkê. Min heta niha du caran li Kerkûk hewlê dîtina vî deriyê han daye, lê, min nikaribû ez bibînim. Qet dîr nîne ku bikarim bibînim jî. Ger qasî dirhemekî be jî bê dîtin, hewceye têkeve muzexanekê.



Medresa İxlasîye

wan pînc medresan: (Medresa Xetîbiyê, Hacî Begîyê, Şikîriyê, İdrîsiyê û Ixlasiyê) Şerefxan tenê Medresa İxlasiyê avakirîye. Min wênê wê medresê di wê kitêbê de belav kirîye. Lêbelê, min cardin xeletîyek kirîye, ku min gotîye eva han Medresa Xetîbiyê ye. Havîna sala 1977'an, ku ez çend rojan di nav eserên Bedlîsê de mam, min Medresa Xetîbiyê dît. Medrese buye kavi. Dikeve ser robar û li rojavayê Camiya Mîr Şerefê bapîrê Şerefxan e. Her wiha, min Medresa İdrîsî jî dît. Di taxa Zeydan de ye, ku bi navê İdrîsê Bedlîsî tê binav kirin û qebra Husamedînê bavê wî tê de ye. Niha ciyê Medresa Hacî Begê, çayxane ye. Li hember Camiya Mîr Şeref e. Ciyê Medresa Şikîriyê diyar nîne. Ez bawerim ku ew navê han xelet hatîye nivîsandin. Ji ber ku di Şerefnama ya çapa Misrê, rûpela 455'an de navê wê Şerefiyê ye, ku jî bal Mîr Şeref ve û di tenîştaya camîya wî ya mezîna de hatîye avakiri-

Eva han jî hêjayî gotinê ye, ku ciyê deriyê hafa Deriyê Bazîyan, li gor lêkolîna di cî de min kirîye, dikeve tenîştaya başûrê rojhilat û jî gelî 26 metre dîr e. Kaniyek li aliyê rojhilat heye. Eva han a ku havînan diçike, dikeve rojhilatê gelî aliyê deşta ku qada wê 1212 m2 ye. Abdurrehman Paşa jî du caran ji bo serhildanek li dijî dewleta Osmanî, hafa derî temîr kirîye û xwe amade kirîye. Li gora qeneeta min ew hafa han ku bingehê wê kevir û herî ye, hafek gelek kevin a pêşîya miladê ye. Hefa Deriyê Ranyê, belko hîn kevintir e jî. Piştî vê, ez du car çûm ji bo kifşa hafa derî. Di sala 1982'an de, min di vî warî de raporek ji bo El-Muessese El-Amme li Asar (Bin-yata Şûnewarên Giştî) nivîsand, di rojnama El-Iraq, di hejmarê roja 20.9.1984 an de hat belav kirin. Gotarek min a din jî li ser şûnewarê derî, di eynî rojnamê de, di hejmarê 27.2.1984 de hat belav kirin.

Destpêk r. 1

Beyana CUD'ê

Cebha Nîştîmanî ya Demokrâtîk a Iraqê (CUD) di 17'ê Tebaxê de di rîya radyoyên herêma şoreşê re beyanek belavkir û wiha got:

"Roja 15'ê Tebaxa 1986'a, teyarên Tirkîyê, bi çend hucûman rabûn ser erdê Iraqê herêmên hidûd, Kurdistanê Iraqê, gundên Kurdistanê yê beguneh ên jî sîdariya rejîma Bexda azadkirî, bombarankirin". CUD'ê da xuyakirin ku ev êrîş bi hevkarîya rejîma Bexda pêkhatîye û him êrîşa Tirkîyê him jî hevkarîya rejîma xwînrêj a Iraqî bi dîktatoriya Tirkîyê re protesto kir.

CUD'ê beyana xwe wiha domand: "CUD di vê erîşê de xeterekê dibîne liser têkoşîna civaka Iraqî ya jî mîletê Ereb û Kurd û jî eqelîyetên milî yê din pêkhatî, ku ji bo aşîti, azadî û mafên milî yê rewa yê Kurd û CUD bang li Yekîtiya Mîletan, raya giştî ya Erebî û navnetewî, bi rêxistinên xwe yê siyasî, sendikayî, komeleyetî û dezgeyên xwe yê hiqûqî û însanî dike da êrîşa hov û har a Tirk protesto bikin û rê li ber êrîşê din bigrin û rewşa xayînî ya rejîma Iraqî rûreş bikin".

MESÛD BARZANÎ

Roja 18'ê mehê Mesûd Barzanî di beyanek xwe de da xuyakirin ku, "di 16 û 17'ê Tebaxê de jî Ordîya Tirk êrîş birîye ser Seraniya, Senat, Watmîn, Nezar û hin ciyên din jî, lê li hember vê pêşmerge ketine rewşa alarmê û xwe amadeyî şer kirine". Mesûd Barzanî di beyanek xwe ya din de jî wiha got:

"Ger Tirkîye êrîşên xwe rane-westîne em diyar dikin, ku emê bersîva wan, li gor wext û mekane nê ku em tesbît bikin, li wan bi şûnde vegeyînin.

PPKK

Polîtburoya Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan (PPKK) di beyana xwe ya 22'ê Tebaxê de, da xuyakirin ku tu tîkîliya êrîşa Ordîya Tirk bi kuştina çend leşkerên Tirk ve tune ye û 17 roj berî kuş-

tina şend leşkerên Tirk, dîktatoriya Tirkîyê biryara êrîşa ser Kurdistanê Iraqê daye.

PPKK da xuyakirin ku pêşketîna şerê pêşmergeyêti ya Kurdistanê Iraqê û zêifbûna rejîma xwînrêj a Iraqî xewa Tirkîyê dirêvîne, loma jî armanç jî vê erîşê pûçkirin û şikandina tevgera rizgarîxwazî ya gelê Kurd a li Kurdistanê Iraqê ye.

Di dawîya beyana xwe de jî PPKK carek din xist ber çavan ku: "Êrîşa Ordîya Tirk a dawî carek din nişan da ku têkoşîna li her perçekî Kurdistanê bi xurtî bi têkoşîna perçên din ve girêdayî ye. Rojêkê zûtir divê em wacibên vê yekê bi cî binin û hêzên xwe bikin yek, bi piştigirî û hevkarîyek dibin sîdariya otorîtek netewî de em werin ba hev..."

PSKT

Partiya Sosyalist a Kurdistanê Tirkîyê (PSKT) jî vê erîşa cûntayê mehkûm kir û wisa domand: "Serokwezîrê hukma faşî, Ozal, nişan dide ku sedema vê erîşê kuştina çend leşkeran e, li hêla Ûlûdere. Piştî vê buyerê hukumet kombîye û biryar girtîye ku leşker bikeve Kurdistanê Iraqê. Bi vî hawayî leşkerê Tirkîyê, dirêjî wî alî sînoran dibe û şer dike, lê hewce nabîne ku raya, an jî îzna meclîsa totîk bistîne. Serda jî, hukumetê rê daye leşker ku kîngê xwest jî sînor derbaz be. Ew kirina han, eşkereye ku haydûtî ye..."

PKT

Komîta Merkezî ya Partiya Komunîst a Tirkîyê jî êrîşa Tirkîyê a ser gelê Kurd protesto kir. Li gor PKT "êrîşa rejîma Evren-Ozal a li ser van insanên ku di erdê Iraqê de dijîn, tu ferqa wê jî erîşên Reagan ên ser Libiya, Lubnanê û Nîkaraguayê ninin û perçekî jî terorîzma navnetewî ye".

Bêyî beyanên van partîyan: Ala Rizgarî, CUD, Devrimci-İşçi, KIP-Komîta Swêd, Kawa, KUK-SE, Partiya Demokratên Pêşverû Li Sûriya, Partiya Hevgirtîna Gelî Kurd Li Sûriya, Partîzan, Rizgarî, Têkoşîn-Komîta Swêd, Tevgera Sosyalist a Kurdistanê, TKP-B, TUDEH, Yekîti Nîştîmanî Kur-

Destpêk r.1

Li Tirkîyê hilbijartin

Hilbijartin li du bajarên (Bingol, Entab) Kurdistanê ne.

Di parlamentoya destîk a Tirkîyê de, kursiyên 11 parlamentêrên 10 bajaran valabûn. Hukumeta Turgut Ozal, biryar da ku, di 28'ê îlonê de li van bajaran jî bo kursiyên vala hilbijartin çêbibin. Li ser vê biryarê, partiyên burjuwazî yê qanûnî dest bi propagandên hilbijartinê kirin, munaqesê û dijayeti di nav partîyan de gurr bûn.

Hilbijartin, di bin nîrê dîktatoriya faşîst, di bin zîlm û zor û kontrola wê de çêdibin. Radyo û televizyon, her roj ji partîya Ozal ANAP'ê propaganda dikin da xelk dengê xwe bidin partîya hukmê dîktatorî.

Partiyên çep, ên sosyalist û yê Kurdî qedexe ne û nikarin tekevin hilbijartinê. Ji ber gelek awayan, hilbijartînek ne demokratîk çêdibe. Û jî ber ku ne li tevayîya Tirkîyê ye rewşa kursiyên parla-

distan, Yekîtiya Sosyalista Kurdistan û Federasyona Komelên Kurdistan Li Swêd bi hev re beyanek belav kirin.

PROTESTOYÊN DERVEYÎ WELAT

Êrîşa Ordîya Tirk a ser Kurdistanê Iraqê li gelek welatên Ewropayê jî bi girseyî hat protesto kirin. Li Stockholmê Federasyona Komelên Kurdistan di 16'ê mehê de li dijî vê barbarîya Ordîya Tirk belavokek belav kir.

Li aliyê din, Komela Kurdistan a Uppsala, ji Uppsala heta Stockholmê meşek protestoyê pêk anî. Kesên meşvan, di bin baran, sar û sermê de li dora 100 km. meşîyan û roja din (23.8.1986) gihîştin ser mitînga Stockholmê. Meşvan li meydana Sergelstorgê kombûn. Parlamentêrê VPK Oswald Soderqvist, serokê Federasyonê û nûnerêkî jî li ser navê CUD axiftin, erîşa li hember gelê Kurd mehkûm kirin û jî hemû kes û hêzên demokrat, pêşverû û aşîtxwaz û hukumeta Swêd daxwazkirin ku ew jî li dijî vê erîşê derkevin, piştigiriya gelê Kurd bikin. Piştî axaftinan, meşdar berê çûn ber konsolosê Tirkîyê û di dîrê jî yê Iraqê protesto kirin. Bêyî KOMKAR, hemû, hêz û rêxistinên Kurd di meşê de cî girtin.

Rojanama Dagens Nyheter -ku rojnama sibê ya herî mezintir e- bi hawakî gelek baş qala meşê kir û pesnê hevkarîya Kurdan da.

ALMANYA ROJAVA

Li Almaniya Rojava, erîşa Ordîya Tirk ya ser Kurdistanê Iraqê gelek bi girseyî û bi xurtî hat protestokirin. Bi taybetî jî hêzên Kurdistanê Tirkîyê xebatek pir baş kirin.

Zêdeyî 20 dilsozên Federasyona KKDK, li Kolnê Muessesa Radyo û Televîzyonê (WDR) îşxal kirin. Daxwaza wan jî televîzyonê ev bû, divê ew jî erîşa cûnta Tirkîyê protesto bikin. Televîzyonê nûça vê tevgerê wek xebera pêşî da. Bêyî vê, cardin endamên KKDK'ê li Ludenscheidê çar derên din (xaniyê SPD, IGM û buroya rojnama Ludenscheider

Nachrichten) jî îşxal kirin. Di vê îşxalê de jî 40 kesî cî girt.

Li bajarê Hamburgê jî KKDK-Hamburg, Devrimci İşçi, ATIF, Dev-Genç (Ewropa), Fedaiyên Gel (Pirranî), Sempatîzanên Partiya Komunîst a Iraqê, KOMKAR û Partiya Demokratîk a Gel di 23'ê mehê de (23.8.1986) li ber konsolosê Tirkîyê meşek protestoyê çêkirin û bi hev re belavokek belav kirin. Her wisa li bajarê Giessen jî KKDK bi tenê, meşek pêkanî û erîşa Ordîya Tirkîyê protesto kir. Li gelek bajarên din jî protestoyên bi vî rengî çêbûn û ev erîşa dîktatoriya faşîst bi xurtî hat protestokirin.

Li gel van xebat û tevgeran, di 26'ê Tebaxê de sempatîzanên CUD, PPKK, Fedaiyên Gel (Pirranî), Partiya Gelê Kurdistan, Yekbûn, Yekîti Nîştîmanî Kurdistan, Roreşgerên Kurdistan, KKDK, KOMKAR, KURDKOM, Gerçek-AVK û Birlik Yolu bi hev re beyanek derxistin û erîşa cûntayê mehkûm kirin.

FRANSA

Di 2'ê meha Îlonê de li Parîs paytexta Fransa jî meşek li dijî erîşa Ordîya Tirk çêbû. Birlik Yolu, Devrimci İşçi, FTIB, İşçi Gerçeği, KKDK, KOMKAR, KURDKOM, TSK û Rizgarî di vê meşê de beşdar bûn.

Ji bilî Rizgarîyê van hêzên han, bi Fransîzî û Tirkî du belavok belavkirin ku tede erîş hatibû rûreşkirin. Rojnamên Fransîzî, bi taybetî Le Monde û L'Humanité bi firehî cih dan mesela erîşa Tirkîyan û protestoyên dijî wê.

DANÎMARKA

Li Danîmarkayê jî, ji bo rûreşkirina erîşa Ordîya Tirk, li ber deriyê Konsolosxana Tirkîyê a Kopenhagê, mitîngêk hat çêkirin. Di mitîngê de terefdarên partiyên Yekîtiya Çep, CUD, Yekîti Nîştîmanî Kurdistan, Fedaiyên Gel ên Îran (Ekseriyet), TUDEH, KUK-SE, YSK beşdarbûn.

Di Pînc Salên Dawî de 861 GIRTÎ HATIN KUŞTIN

Wezaretê Edaletê ya Tirkîyê di derheqê kesên kuştî û wenda de, beyanek da.

Li gor beyana wezaretê, di van pînc salên dawiyê de di girtîgehê Tirkîyê û Kurdistanê de 861 girtî hatine kuştin.

Wek tê zanîn li gor beyanên resmî tenê di girtîgeha Diyarbekir de, bi îşkencê 32 kes hatin kuştin, ji bilî kesên jî bêmîkaniyeta girtîgehê hatine kuştin. Reqema 861 kesî jî jî rastîyê dîr e. Ev, ew reqemî ku ew mecbûr mane diyar-bikin.

Di sala jî gor beyana wezaretê, kesên li derveyî welat li wan tê gerîn 338 in. Ev reqem jî jî rastîyê dîr e. Bes kesên jî ber dawa TOB DER (Komela Mamosteya) û DISK (Sendîqa Karkeran) ê li war tîrê gerîn û li derveyî welat in, jî vê reqemê pirtir e.

Destpêk r. 2

LI SER EDEBIYATA ZAROKAN

zuyê (ew tiştê ku li ser tê axaftin yan jî nivîsandin) cihê ye, ê ronakbîrêkî sosyalist cihê ye, ê ronakbîrêkî welatekî paşdemayî ku pêntîsa xwe kirîye xizmeta emperyalîzmê, cihê ye. Kanê, wek bavekê mamoste ku zarokê xwe jî teşwîqî mamostetiyê bike, wek bavekî ressam ku zarokê xwe jî teşwîqî ressamtiyê bike, wek daxwaza pêşdebîrîna qabiliyeta wî ya di vî warî de.

(Dóm dtkê)

HEVPEYVÎN

Dengbêjekî ji Kurdistanana Sûriyê: M. ŞÊXO

ARMANC: Heval Mihemed Şêxo, te derd û janên gelê xwe û welathîziya xwe di stranên xwe de daye xuya kirin. Ji ber vê yekê ye, ku gelê Kurdistanê û şoreşgerên wê ji te hez dikin. Em dixwazin çend pirsan ji te bikin û bi bersîvan te, te xweştir nas bikin û bidin naskirinê. Tu dikarî bi kurta-yî jiyana xwe ji me re bêjî?

M. ŞÊXO: Ez di sala 1948'an de, li Kurdistanana Sûriyê li bajarê Qamişlo li gundê Xecokê hatime dinê. Ez ji binemalekî cotkarê piçûk bûm. Min xwendina xwe a seretayî (dibistana destpêk) li gundê xwe qedand. Piştî re ez hatim bajarê Qamişloyê (1965). Li vê derê min xwendina xwe domand. Heya sinifa neha min li Qamişloyê xwend. Piştî re min şandin leşkeriyê. Paşê ez ji leşkeriyê hatim afûkirin. Piştî afû bûna min a ji leşkeriyê, di sala 1969'an de ez çûm Lubnanê, bajarê Beyrûdê. Li Beyrûdê, ez çûm ketim Merkeza Xwendina Yekîtiya Muzîkê. Min li wê derê du dewran dersa muzîkê stand. Di wê demê de min li Beyrûdê di nava koma muzîkê de stranên Kurdî û muzîka Kurdî pêşkêşî gel dikir bi şiklê konsêran.

Sala 1972'an ez vegeriyam Sûriyê, bajarê Qamişloyê. Li wê derê min kar li Rimêlan (Rimêlan, ciyê ku li seranserê Sûriyê ji hemû deran pirtir petrol li wê derê dertê-Armanc) stand. Li Rimêlan ez bûm serokê komika muzîkê. 1973'an de ez ji wir derketim. Ji wî katî şûn de ez mame bêkar. Di sala 1974'an de ez çûme Kurdistanana Iraqê. Ez heya şikestina şoreşa li Kurdistanana Iraqê, mam. Piştî têkçûna şoreşa Kurdistanana Iraqê ez çûm Îranê. Li Îranê ez bûm mamosteyê dibistanê yê zimanê Erebi. Ez heya sala 1983'an li Îranê mam. Sala 1983'an ez vegeriyam Sûriyê û heya niha ji ez li Sûriyê me û bêkar im.

ARMANC: Te çawa dest bi stranan kir û çî bû sedemê ku te hunerê xwe pêşkêşî rêka welatperwerî kir?

M.ŞÊXO: "Beroşa ku ez jê nexwim, ez arê wê nakim". Ev gotin, gotineke Kurdî ye û ez ji mirovekî Kurd im. Ji piçûkî de mereqa min li ser stranan û muzîkê hebû. Hêj ez zarok bûm û di sinifa sîsiyan de bûm, min guhdarî radyoya Kurdî ya Erîwanê dikir. Ji ber ku wî katî bes radyoya Kurdî ya Erîwanê hebû. Guhdarîkirina radyoya Erîwanê hem mereqa min zêdetir dikir, hem jî bû sedemê ku ez hin fikrên nû bûm. Vêca min bawerî anî, ku stran û muzîk parçeyek ji doza welat in. Ez dikarim bêjim ev bûne sedemên bingehînî ku ez bi Kurdî stranan bêjim. Her milletekî muzîka wê heye û ew muzîk perçeyek ji pêşveçûna milletê ye. Ji ber ku ez jî Kurd im û milletê Kurd, milletekî bindest e, zimanê wî hatiye qedexekirin, hewce ye, ku mirovê welatperwer, hunerên xwe di vê rêça han de bide şixulandin. Min jî ev kiriye. Ev jî bo milletê me pir girîng e. Ji bona vê yekê hewce ye, ku ez hunerên xwe di rêça pêşveçûna welat, muzîk û zanên welat de bi kar binim.

Gelek hunermendên dilsoz ji nava gelê Kurdistanê derketine. Ji van hunermendan, ê ku li seranserê welat bi dengê xwe û bi tenbûra xwe tê naskirin yek jî Mihemed ŞÊXO ye. Me pêwîst dît, ku hevpeyvînekê bi Mihemed ŞÊXO re bikin û wî xweştirin bi hinek nêrînên wî ve bi rêka Armancê bi gelê xwe û welatperwerên wê bidin naskirinê.

Kesên welatperwer bi hunerên xwe xebata pêşvebirina welatê xwe dikin. Hinek bi çekan, hinek bi nivîsandinê, hinek jî bi saz û stranên xwe. Ji ber van bîr û baweriyên û pêwîstiyên ez ji van hunerên xwe (stranbêjiya xwe) di vê têkoşînê de bikar tînim. Heya ez hebim jî ezê bikar binim.

ARMANC: Wekî tu dizanî, gelê me di bin nêrîna mêtîngê-kariyê de ye û welatê me jî alî mêtîngêhkarên û emperyalîstan hatiye parvekirin. Tu rizgarbûna welatê me çawa dibînî?

M.ŞÊXO: "Çavê li deriya xwelî li seriya". Ev gotin gotineke pêşîya ye. Ez dixwazim vê gotinê bi vî awayî mane bidimê: Ger em nebin wê dost çî bikin? Berî her tiştî divê em hebim, piştî re em hevîya xwe ji dostan bikin. Ez vê gotina han dikim ne ku tê wê manê me tu dost nîne. Di vir de daxwaziya min ew e, ku ez bidim xuyakirin, berî hemû tiştî divê em hebim û ji xwe bawer bin. Ez dixwazim niqteka din jî bidim xuyakirin. Heya ku dewlemend û sermayedarên welat "pêşevaniya" tevgera Kurdî bike, doza welat bi ser nakeve. Ger serbîkeve jî wê sermayedar ji bo xwe bi kar binim. A diduyan jî ew e, ku emperyalîst heya îro jî tu caran nebûne dostên gelê bindest û ew tu carî rizgariya me nadin me. Ger ji bêçareyî bidin jî wê bidin hevalbendên xwe, sermayedaran. Ji bona vê yekê ez dibêjim rizgarbûna welatê me ne di bin pêşengiya karker û xizanê welat de be nabî. Yanî ez rizgarbûna welat di bin pêşengiya karker û xizanên welatê de dibînim.

ARMANC: Tu di têkoşîna rizgariya civakî û netewî de çî bar li ser milê hunermendan dibînî?

M.ŞÊXO: Li gor ditina min hunermend, ji bo daxwaziya gelê xwe divê wek berdevk bin. Yanî daxwaziya gelê xwe di hunerên xwe de bidin xuyakirin. Ji bo vê yekê jî ez hewce dibînim, ku daxwaziya gelê xwe di hunerên xwe de bidim xuyakirinê. Wekî ku tê zanîn, hunermendî qetek (perçek) jî çanda gel e. Her hunermend bi pêşkêşkirinaê hunerên xwe çanda gelê xwe didin xuyakirin. Ew jî divê bi rengekî daxwaziya geli be. Û jî bo pêşveçûna gel kar bike. Berî hemû tiştî ev tişt jî hunermendan tînxwestin. Ez di vî warî de dibînim, ku di têkoşîna rizgariya netewî û civakî de tiştên dikeve ser milên hunermendan ew in, ku daxwaziya welatê xwe û gelê xwe di hunerên xwe de, di stranên xwe de, muzîk û edebiyata xwe de bidin xuyakirin. Ev tişt pêwîst in û berî herkesî jî hunermendan tînxwestin. Da ku muzîk, stran, edebiyat, zimanê gel pêşve biçin. Da

ku giyanê welatperwerî û şoreşgerî li ser piya bimîne û xurt bibe. Bi bawerîya min, tiştên ku di qonaxa têkoşîna rizgariya civakî û netewî de ji hunermendan tînxwestin, ev in. Di vê xebatê de divê hunermend ji tiştêkî netirse. Wekî pêşmergekî bêhempa ji bo welatê xwe canê xwe bide. Hunermend jî wekî pêşmergekî welêt, ne bes di xweşiyê de, di hemû nexweşiyên û hoyên giran de divê hunerên xwe di xizmeta têkoşîna rizgariya civakî û netewî de bi kar bîne.

ARMANC: Li gor te sinet çî ye divê sinet bi partîzanî be yan na?

M.ŞÊXO: Li gor ditinên min sinet qetekî ji hunerê gelan e û wekî ku me dabû xuyakirinê, divê huner zimanê gel bin. Ji bona sinet jî em dikarin vê tiştê bêjin. Belê li gor min, divê sinet tebeqî (çînî) be. Lê ne ku fikir û meyl têxe nava hebo hebo partîyan û rêxistinan. Yanî partîzanî be ji bona çîne be. Sineta ku ez diparêzim, divê ji bona çîna karker û cotkar be, ne ji bona çîna sermayedar û burjuwazî be.

ARMANC: Qasî em dibihîzin, ev çend sal in, ku tu ne wek berî çend salan bi germî distirêyî. Sedemên wê çî ne?

M.ŞÊXO: Ez berî hemû tiştî dixwazim viya bidim xuyakirin, ez wekî berê me. Lê hinek tişt hatine guhertin, wekî ku berî çend salan zimanê Kurdî hatibû qedexekirin. A din jî, di nava Kurdan de hunermendên stranbêj kêm bûn. Wê demê ji niha bêtir dengê min dihat guhdarî kirin û seh kirin. Lê niha ji ber ku zimanê Kurdî li ba me hinek bi serbestî tê axaftin, partî û komik jî berê zêdetir bûne, êdî wek berê dengê min jî nayê sehkirin. Li gor ditina min sedemên bingehîn ev in. Sedemek din jî ew e, ku her partiyek dixwaze ez bi wan re bim, heta yê dengê min belav bikin. Ez vê yekê qebûl nakim. Bila qet belav nekin, ez ne malê tu partî û rêxistina me, ez xwe wek malê welatê xwe û gelê xwe dibînim. Ev tiştên ku niha min gotin ew jî dibin sedemên ne belavbûna dengê min. Ez dişa dibêjim, ku ez ê beşê me û li gor bawerîya min hîn jî berê zêdetir im.

ARMANC: Armançên te di qatê-pêştedir de çî ne û tu dixwazî çî bikî?

M.ŞÊXO: Armançên min di qatê pêştedir de ew in, ku li gor imkannên xwe û gelê xwe ji bo rizgariya welatê xwe xebatê bikim. Min pêşiyê jî dabû xuyakirin û gotibû, armançên min ew in û wê her ew bin jî. Ezê ji niha û bi şûn de jî li ser vî karî bim û berdevwama karê xwe bim.

ARMANC: Di têkoşîna rizgariya netewî û civakî de bawerî-

riyên te yê çîneyetî çî ne?
M.ŞÊXO: Li gor bawerîya min di têkoşîna rizgariya netewî û civakî de ku ne bi destê çîna karker û kedkarên din be û ne di pêşengiya wan de be, em rizgar bin. Rizgariya me ya heqîqî encax bi destê çîna karker û kedkaran dibe. Wekî me berê jî gotibû, sermayedar bes ji bo xwe dikin. Rizgariya bi destê sermayedaran ez rizgariya gelê me nabînim. Ji ber ku sermayedar wê her jî bo xwe bin. Ger wisa be, wê dişa gelê Kurd bindest bimîne. Ha em bindestê sermayedarê Kurd ha em ê sermayedarên biyaniya ne, ji bo çîna karker û kedkaran tu ferqa wan tune ye.

ARMANC: Tu Kurdistanekê çawa difikirî?

M.ŞÊXO: Ez Kurdistanekê yekhev û azad û serbixwe di pêşengiya zarokên karker û cotkarê zana û tîgihîştî difikirim û dixwazim.

ARMANC: Daxwazên te jî bizavên rizgarîxwazên Kurd yê li her çar perçan çî ne?

M.ŞÊXO: Yekîtiyê... Ji ber ku her tişt di riya yekîtiyê re pêk tê.



M. Şêxo bi xortan re

ARMANC: Li gor bawerîya te dijminên gelê Kurdistanê û dostên wî kî ne?

M.ŞÊXO: Dostên gelê Kurd, ew in ku berî her tiştî ew gelên ku zilm ditîne û hê jî di bin zilmê de ne. Dijminên wî jî, her ew kesin ku zilm kirin û hê jî zilmê dikin. Ger te bivê zelaltir bikim, ez dikarim bi vî awayî bêjim: Dijminên gelê Kurdistanê, dewletên mêtîngêhkar û hevalbendên wan emperyalîzma cihanê û di serî de emperyalîzma Amerika Yekbûyî ye. Di nav welatê de sermayedarên Kurd in.

Dostên gelê Kurdistanê jî gelên bindestên dinê û welatên sosyalîst in.

ARMANC: Daxwaza te jî kovara Armanc çî ye?

M.ŞÊXO: Daxwaza min ji kovara Armanc ew e, ku çî tiştê çap dîke bi rastî û heqîqet çap bike. Ne bêje ev hevalê me ye, yan jî ne ji me ye. Tiştên wî guhartî tê de çêbike, an jî çap neke. Her tiştî weke wî mafê wî bidîyê, weke ku hêjayê wî. Ez hêviya pêşketinê jê re dikim di rêya rastî û diristî de û spas.



Bistîkek ji festîwalê

DANÎMARKA

Serfiraziya Festîwalê: Dostaniya Gelan

Em qasî sed mihacirên Kurd li wargeheke Danîmarka dijîn. Ev wargeh a xaça sor e û navê wê Kysthospitalet e. Wargeha me 4 km. ji bajarê Kalundborg dûr e. Ji derveyî me hinek mihacirên Tirk, Lubnanî û Filistinî jî hevkarê jiyana me ne, di vê wergehê de.

Bajarê ku em lê dijîn, dijîniya biyaniyan lê xurt e. Her sal li vî bajarî festîwalek teybetî heye. Gelê bajêr pir divexwin û kêf û reqsê dikin. Nijadperestên herêmê festîvalê jî bo xwe firsend dibînin, gel tîjî dikin û. Pjîdikin (tahrîk) û êrîş dibin ser biyaniyan. Di 1985'a de, di 19'ê Tîrmehê de roja destpêka festîvalê êrîş birin ser otela ku mihacirên Îranî lê diman.

Îsal jî pir gotin hatin kirin. Digotin "dijminên biyaniyan xwe amade dikin ji bo roja festîvalê êrîş bibin ser biyaniyan". Berî festîvalê

bi sê mehan rojnaman texmîn dikirin, digotin, polîs, serokbeledî û berpirsiyarên xaça sor nîqaşa tedbîran dikirin. Gelek mihacirên herêmê jî ketibûn xofê.

Lê belê komîta wargeha me, Komîta Mihacirên Kurd û Tirk, biryar girt ku bikeve festîvalê. Bi alîkariya bizava dostên biyaniyan, di programê festîvalê de seetek kat da bi cih kirin. Komîka me ya folklorî xwe amade kir. Komîta me jî bi afîş û axaftinê bû sazkarê vê rojê. Ji ber ku komîka me kincên gelêrî nebûn, me li ser singên fanîleyên komikê ala Kurdistanê û xerîta Kurdistanê çêkir. Li ser paçek mezin jî xerîte û ala Kurdistanê me li pêşîya xwe xist û em ketin festîwalê. Gelê Danîmarka yê dostê biyaniyan û hêzên aşîtxwaz jî ketin nav me. Komîka me folklorî, dengbêj û sazbandê me

festîval pir geştir kirin. Gelek rojnamevan li festîvalê amade bûbûn. Ewan guman dikir wê şer derkeve. Lê dijminên biyaniyan keys neditin tu êrîşan bikin. Rojnâmevan jî şaşbûn. Keyfa gel pir jî beşa programê Kurda re hat. Rojnâmevanan hevpeyvîn bi komîta me re çêkirin. Pirs kirin ku ji ber cih tu problem çênebûn. Derd û nexweşiyên me pirsîn û weşandin. Axaftina ku bi zimanê Îngilîzî me amade kir û wêne ji komika folklorê me û ji xerîta Kurdistanê weşandin. Keça Kurd Vîyan li ber sazê govend girt bala rojnâmevanan û gel kişand. Bi kincên Kurdî ên netewî wêneyê wê hat weşandin.

Ev karê ku me kir, em bawerîna minakek pir hêja bû. Piştîgiriya gelan û hêzên aşîtxwaz jî êrîşên dijminên biyaniyan re keys nehişt. Bavê Zerdest